

# DUJGIR

HEJMAR 2, 1995, HER SÊ MEHAN CAREKÊ DERDIKEVE





# DUGIR

HEJMAR 2, 1995, HER SÊ MEHAN CAREKÊ DERDIKEVE

KOVARA KURDÎ LI DERVEYÎ WELÊT  
EV KOVAR LI GOR ALFABE VEKÎT Û RÊZIMANA  
MÎR CELADET BEDIRXANÎ DERDIKEVE

## XWEDÎ

Kawa förlag

### Berpirsyarê giştî

Dr. Saîd Mele

### Birêvebirên kovarê

Ehmed Huseynî  
Zagrosê Haco  
Yehya Yûsif

### Mîzanpaj

Arif Zêrevan

### Berpirsyarê hunerî

S. Rêzanî

### Abonetiya salane

150 SKR

### Adres

DUGIR

Box 3437  
165 23 Hässelby  
SWEDEN

### Tel

46 - (0)8 - 36 65 16  
46 - (0)8 - 38 39 34

### Faks

46 - 225 - 144 06

### Postgiro

692357-7

ISSN: 1400-5913

## NAVEROK

- 3 **Pêşgotin**
- 5 **Heyva di himbêza gulberoya jûreya min de,**  
*Hendirên*
- 8 **Seîd Rêzanî, bêdengî, şîn û tirs,**  
*Rodî Newrozî*
- 10 **Sîsirkê Hesinî,**  
*Selîm Berekat*
- 18 **Loloyên Adarê,**  
*Selam Sadiq*
- 20 **Midya, bixûrê bişewitin!,**  
*Nizar Agirî*
- 21 **Taşê,**  
*Jacques Prevert*
- 22 **Taha Xelîl, helbestvanê giyanên mişext û**  
**dengê dengvedana bêdeng û dereng a**  
**axînan,**  
*Ehmed Huseynî*
- 25 **Mane biraderê me nan pê ve daye û hertişt**  
**xelas bûye,**  
*Ehmed Huseynî*
- 31 **Ez dîn im dîn,**  
*Taha Xelîl*
- 32 **Evro, dihi, evro,**  
*Beroj Akreyî*
- 34 **Uzunname - II,**  
*Rezo Osê*
- 40 **Şêxê Kesk,**  
*Mihemed Efif Huseynî*
- 42 **Kovareke kurdî ya nû - Delav - ,**  
*N. Elî*
- 43 **Hunermendekî Kurd - Xalid Baban**

# PÊŞGOTIN

**D**i nav çirava genî ya vê serdema bêbext û mirovkuj de, li bin perên cîhana yekemîn û serdest a ku li gor berjewendiyên xwe danûstendinê bi çarenûsa gelan re dike, li beramberî pêlên kovandar ên nûçeyên kurdên vê serdemê û yên – Habiî û Qabilistana – yan jî Kurdistana surdarî û matmayîna reha (mutleq), ma gelo rewşenbîrê kurd dikare ji xwe re koşeyêke rewan û hêmin bo vehesîna giyanê xwe û ji bo bikaranîna xewna xwe, peyda bike?

Ma gelo li beramberî pêjna bi gurmîn a lingên bûyer û rûdanên dramatîkî û malkambax, li ber dengê sîmfoniya giryanê û xuşîna pêldar a xwinê; çûna bê xarixwestin û bê veqer a xoşewîstan û di bêdengiya zîz a goristanên bê kêl û bê wesiyetname û tarûmar de, rewşenbîrê kurd dikare guncînekê di navbera xewnê û rastiya jiyana nejiyayî de durust bike?

Her subeh, di dojeha vê tarawgehê(surgungehê) de, bi çavine qerimî, berya ku xewna ebedî bi dawî bibe, em ji xewê çeng dibin. Ne xewn derew û nerastiyên xwe radiwestin û ne jî bêyî xewnan em dikarin bişî.

Li ser duryan û rêçên bêkutayî yên vê xewna gawirane; hemî asoyên şikestî pencereyên xwe ji bo ronîkirina nasnameyêke gemkîrî û zimanekî serjêkîrî, vedikin. Wexta ku tîrêjên azadiyê dihingivin kevîyên zuhabûyî yên giyan, ziman jî; wek gulaberbero, ber bi kûrahiya birînê xwe ve dizîvire. Wexta ku xewnên azadiyê di bişkojên berbangê de dest bi qolincan dikin; ziman jî, wek Sîmerxekî (fînîks) ji xweliya serê çiyar ji dayik dibe.

Ziman li gel desthilatdarî û zorbazîya xwe, bi hêminî, ji hinav û ji şaneyên kêlikên tawanbar, ji angoyên çelmîş yên angoya bingeîn a hebûnê dipijiqe û reşgirêdana xewnê bi naveroka xwe dixemilîne.

Ziman dibe gerzel; em dibin dilên cih û demê!

Ziman dibe agir; em dibin ardû!

Ziman dibe nîfir; em dibin qurban!

Ziman dibe dahênan û afirandin; em dibin xelat û diyar!

Ziman dibe alav; em dibin mebest û armanç!

Ziman dibe nivîsandin û em jî dibin prosesa azadiya nivîsandinê!

Nivîsandina di xewnê de prosesa azadiyê berzîr û kûrtir dike. Li wir, di nav pencên dilovan de, mirov, bêyî pût û pûtperestiyê, bêyî Xwedanên êl û malbendan, bêyî serkêş û binkêş û qiral û qiralkan, dikare li xwe û li şiyana hestên xwe ewle bibe, dikare alavên derbirinê ji bêrûmeriya sextekar û cambaz û bazirganan rizgar bike, û bi dilsojî, bi kêlîka xwe re ku pîroz û sava ye, bijî.

Di vê jiyandinê de, ziman jî, wek afirîdeyekî jîndar, dikare ber bi asoyên teze de bifire.

**W**elatekî dagîrkirî, nexşeyeke çar perçe, talaneke rojane, wêraneke giştî, koçbarkirineke efsanewî, kuştineke bê sînor, zindan û girtîxane û qamçîbazên hovane, leşker û tang û top û cibîlxane, sînor û mayin û pasvanên çavsor, serbaz û serleşkerên psîkopat. Û xewna azadiyê ya ku xwe li gerdena Cûdî û Qendîl û Şaho û Dugirê rapêçandiye.

Xewneke bêcir; req, dilkevir û bê nan û xwê.

Ji cergê Mezopotamyayê û ji toza ber lingê hespên kihêl ên siwar û xweşmêrên Medyayê diherike, li bin guhê sûr û kelehên Nînewayê dikeve, û ber bi dastan û sirûdên dîroka rûreş de radikişe, diherike, û li ser eniya zinar û latan, li ser hinarkên deşt û dol û pesaran tovên xwe belav dike, di birînên berfireh ên zimanê kew û qulingan de dihêwire, tîna kulilkan dişikîne û serê xwe li ser balgeha şevistana mişext û penaberan datîne.

Ziman di maka xewnê de geş dibe!

Xewn di dergûşa çavên bendemanê de dixilile!


Ziman, bi nan û ava xewnê, bi nermebarana azadiyê, bi jena nasnameyê, ji nû ve, asoyekî dilşad ji keskesora çiyar re diafirîne. Di wê keskesorê de, dimenên ronak ên kesayetî û têramandina rewşenbîrên kurd dixuyin.

Zimanê ku serkêşiya karwanê şhîdan dikir û dike, zimanê ku xwîna xwe ji bo bidestxistina azadiyê û nasnameya netewî rijandiye, zimanê ku di şerê nasnameyê de bûye şhîdê şhîdan, dê çawan, bêyî xewneke mezin, bikaribe careke di ji dayik bibe?

**DUGIR jî, di çarçewa bikaranîna peyva kurdî ya resen de, peyva** ku bi kotekî em ji wê bêpar hiştine, wek ezmûne, dê sefera xwe ya xewnamêz berdewam bike, dê bi dilpakî û bi dilovaniyeke dayikane ji bo avdana peyva kurdî bixebite. Di xebata xwe de dê hewl bide ku naverokê bo kesayetiya zimên biafirîne.

Ne wek dibistan, ne jî wek dezgeh û rêberî, tenê wek pirojeya hîlbijartina deqên wêjeyî ên ku di serencama dawîn de bikaribin çêja rastîn ya nivîsandinê bighînin xwendevanan, dê Dugir sefera xwe berdewam bike.

Sawa dîrokî û serekane ya ku Dugira piroje pêkaniye ziman e. Ji sawa zimên em dest bi weşana xwe dikin û di sawa zimên de jî, semageriya bêdawî ya pênu-sê dest pê dike.

Di navbera herdû destpêkan de afirandina rastîn û mercên nivîsandina spehî destnîşan dibin. 

**DUGIR**



## Heyva di himbêza gulberoya jûreya min de

**"Ez im, bi tenha xwe, xewnên xwe  
li ber çavên subeha ji qûmê gem dikim"**

Na:

Me bi xwe rêçên xwe ji destên xwe berdan û em rawestiyan.

Me bajarên xwe xeniqandî bi cî hiştin

Li wir bû,

Li vir na: Dizanim!

Me tîna xwe bi guvaştina (me` neya) felsefeyan dişikand û me dîroka xwe ya pêxwas bi sergermiya bîranînên bîr talan kirî û me temenê xwe yî rev-yayî dixapand, me pêlavên lingên bê numre yên mirinê pêşkêşî dîrokê di-kirin, da ku di nav toza dengvedana bêrikirinê de rêberiya lêgeran û he-nasbîrîna sîmayên me yên bişaftî bike; da ku rêberiya bejna rêzkirina me bike.

Hawarên zeviyên wek gunehbarên bê guneh li ser oqyanosa kerr û li ser qafên şevpestiyê dizingyan.

Bayê ku bi izrê diket, û sazişkarên çenebaz û çiyayên te, li jêr tozebarana ku kuxuka çiyayê bi ser dolan de digindirand, bi pifkirina ingirî û bi hilma çiyayê te xwe hênik dikirin.

Pîrê jî; bi awirên weryayî, stêrên ku bendewariya şiyarbûna şevê dikin, sî-mayên kal ên destanbêjên lal û bi dastanên xwe yên nivçe, li ser sîberên çarenûsa nenasî matmayî ku mirin hatiye dehdan, konkê xwe dirêse.

Di nav qamçiyayê de sergêjahiya hespên şikestî berz dibû.

Li bin esmanekî birîndar xirtexirta piyên gornepaşan ji gewriya zarokên sêwî yên jiyayê bi ser wê wêranê de ku jiyayê bi hebûnê ve girêdayî bû, be-lavdibû.

Sînorvan û pasvanên wirr û bê ezmûneyên dîrokî, fêlbazan jî, bi arezûyên dawîn ên şikestî û jibîrkirî, li xwe xweş tanîn.

Na:

Me bi xwe rêçên xwe ji destên xwe berdan û em rawestiyan  
Me bajarên xwe xeniqandî bi cî hiştin

Li wir bû

Li vir na: Dizanim!

Ez û `edema aramkêş jî, wek cêwiyar ligel qonaxên kor bi hev re hatin, min xwe di koşeya tarawgehê de ve-şart, tarawgeha bi ebrûyên girêdayî û pîrîtî bi tinazan dabeşbûye, zencira segê şahzade di tûnela tenhatiya wek qûma kombûyî de, tarawgehê dikişkişîne.

Dem jî li teniştê min wek jinekê bi destên hesinî û bi eniya qermiçekî dîroka ku ciwanîtî li ser ciwaniya xwe dibêje, gem dike.

Ma gelo dê ev sefer bi serpehatiyên min kuta bibe yan dê bi dawiyê ke nedibirê de bi dawî bibe..?

Fortên wan bi agahdariyên nebihistî ku ji devên wan derdiçin valahiyê di bin lingên wan de diherifîne.

Çima bi tembiya pêxemberên xem-

bar rastiya bi baweriyê rapêçayî poşman nebû?

Xwedê ligel çira gumanê ya di destan de di nava ebediyeta xwe de ber bi ku ve diçe?

Xuşkên me jî, bi kirasên xwe yî ku bîna evîne ji wan difûre, ji dîrokê re serpehatiyên sergerdaniya me dineqîşandin.

Cîgehên bê xew û lerza min î mijînî; nalîna xewna minî xewrevînî digotin, û biranînên bê bir sirûdên zaroktiya jibîrkirî bikartanîn.

Wexta ku tavsork û sîbera demê dibin wek hev ez li ku me?

Dem ber bi ewran de difire û sefer jî ber bi roavahiyê de radikişe,

Tu li ser milên van kolanan dibî darbestek, dengên ku li şûnewaran hati-bûn hiştin berhev dibin û wek derengiyê şûnewaran winda dikin.

Ey dudilo! Tu di nav veşartina termê jîmaran û salnameyan de dudil î!

Ey sergerdano! Tu di nav demsalên nameyên kombûyî de sergerdan î!





Tu li têramandina di wênayên cîgehên qîzane de ewle nabî!

Ewr keçên esman bûn û elend jî di keçan de diramiya, wexta ku bi ser laşê ewran de dibariya, elend şiyar dibû û bi xunava gulgeniman destnimêj digirt, û keskesora vê êvarê jî wek keçên min ên ciwan, wek ku di cejnê de bin, dawên kirasên xwe yên rengîn bilind dikin û di ser laşê minî zer û der-yayî re derbas dibin.

Heyv jî bi hinarkên xwe yên sor li paş bejna perjanan hildiperike  
Qurnefelên xav bi bîna axê dihatin diqdiqandin,  
Û tîrêjên şuştî yên subehê bi çarpiyan diçûn û xêzên çerxa gerdûn dikanandin.

Gelawêj jî di hêlîna kakêşê de diraza.  
Bêagah me li hevûdû temaşe dikir, me awir ji hev vedidan,  
Û şev diramiya, dipûniji, mû bi mû, keziyên şevê di neynika demê de sipî dibûn.

Û pencên bayî, li wî alî dîwarê bédengiyê newaya perîşanan distira.

Na:

Me bi xwe rêçên xwe ji destên xwe berdan û em rawestiyân.

Me bajarên xwe xeniqandî bi cî hiştin

Li wir bû

Li vir na: Dizanim!

Ey ji xwe derçûyo!

Bax ne dostên te ne, di wir re nebuhur!

Awirvedana xwe ji ser rûyê tenhatiya hênijî raket!

De pencereyên xwêdangirtî bi ser qiralkan de bihejin; qiralkên ku li ser bân ji bendewariyê qerimîne, ku dayika te ji ber xwe ve le `net li qiralkan tanî û bextê te wek bextê wan didit.

Seqema ku ji xweşiyê jî dest xwe diçû jî te didexisî, qonaxên ku hizir di nav wan de bê şarezayî bi rê dikeve, xafilbûn wan gêj dike.

Rondikên guliyên berfê, li ser tayên tîrêjên nexweş ên rojê ku li ser baskên darên çongdayî ne, dimeyin.

Xirecira kîlîta peywendiyên me, û bawîşkên katên pîroz bi destvalahiye-ke bînteng, di gewriya kînişt de, di çermê tenhatiya te de radiperin lo!

Kevok li ser baskên zîvînî yên bagerê bi bîna esman mest dibûn, bédengiya dilsoj ya hingivê biraninan bi ser şaneyan de belav dike.

Guman ji ewran dibare, û sefera xwînê ji damarên bêhêviyê dipijiqe,

Destên te jî; bi nehênî, mûmên bêfedî yên vî bajarî û tenhatiya ku li vê odayê belav bûye, diçinin.

Li vir bû

Li wir na: Dizanim lo! 

# Seîd Rêzanî, bêdengi, şîn û tirs



Bêdengiya reha (mutleq) ya di wêneyên rengîn de zimanê hevpeyivînê bi xwe re amade dike. Kevokên bejî stiran û dilokên jina kurd ji ber dikin. Li dûrtemaşekirin û rada dîtîne şîniyên Seîd Rêzanî ne. Kurdine bê aligirî, wisa pir bi lez dixuyin, lê di kûrahiyan de, di hinavên wan de tiştine nediyar û himbêzkirî berz dibin. Dîmen bi asoyên xewnê tèn neqîşandin û çavên qerimî wek stêrkan ji esmanê bendemanê dirijin.






Di berhemên wî yên hunerî de, di stiran û saz û wênekêşana wî de, şerm û fediya hebûna di jiyane de peyda dibin, ev şerm û fedî S. Rêzanî ber bi aşîti û dilovaniyê de dehf didin.

Di vî wari de, Seîd mirovê aşîtiyê ye, tu carî nikare bi diwariyê re bigunce. Lewra berhemên wî mîna wêneyên diwarên kiliseyan bêdeng û rewan in. Herwisa ku li ser xatirxwestinê û li ser windakirinê û li ser şoreşê distirê, dişa rewan e.

\*\*\*

Di berhemên xwe de, yên ku bi rengê zeytê hatine nigarkirin, S. Rêzanî cuda ye. Wexta ku mirov li wan wêneyan temaşe dike, mirov nermahî û çelengiya peyivîne hest dike, kurtepista jinan dibihîse.



Sê jinên bi tenha di şahinşahiya cilûbergên rengîn de, li dudiliya dawîn dipirsin, dudiliya ku ji kirasên rengîn diherike. Ev hersê jinên kurd doza çi dikin? Çi li ser eniya wan hatiye nivisandin?

\*\*\*

Gerek em bi awakî giştî li berhemên S. Rêzanî temaşe bikin, ango gerek em jiyanê wî û mûzîka wî û wênekêşana wî ji hevdu cihê nekin, çinkî di navbera xemgîni û renckêşana wî de valahî peyda nabe, û ne ji bînok û tîbînî peyda dibin. S. Rêzanî naverokeke hevgirtî ye, ev hevgirtin bi şîr û katjimêrên tirsê têt dagirtin. Şîr û tirs: ji kê, pirs di vir de ye?

RODÎ NEWROZÎ



## Berf û wêran

**b** erf dibare. Şeş rojan ji bilindahiyên û ji kûrahiya hinavên me berf dibare, rengê sipî me şaş dike lewra em berfê li ber çavên xwe wek çînîna ku li ber mel-hêban bi ser forman de belav bibe, dibînin. Me şaş dike lewra em benderan sipî dibînin, em qantiran sipî dibînin, qantirên ku li dora benderên pûş digerin; cencere û cotkarî, ji berfê, ji me re dixuyin.

Berf di sopan de ye, şeş rojan agirekî ji berfê di sopan de ye, û şeş rojan li hawirdora me vinevîna mêşên ji berfê ye, mozqirtkên ji berfê, balendeyên ji berfê ye, xaniyên ji berfê, gundên ji berfê, û gîhayên ji berfê ku hildiperikin diwaran, banan derbas dikin, û bilind, ber bi valahiye de radikişin û gurzên ji kulilkê berfê bi xwe re dibin; pesnîne sipî ji vê dînbûna sipî bi xwe re dibin.

Di kelkela havînê de wexta ku nîvero jî disincirî û wexta ku mozên sor jî ingirî-nê serxweş dibûn, me dizanibû çawan xwe jî wan biparêzin, lê li beramberî mêşên berfê; li beramberî derziyên nediyar ên ku dighêjin hestî, em dikarin çi bikin?

Em- ên zarok- mozên sor ên havînê har dikin. Em hetanî nanik darekî radi-din qula kelmozê, kelmoz der dibe, moz har dibin û em wan didin ber çekên xwe, lê mêşên berfê mêşîne hesinî ne, ma dê goşt li hemberî hesinî çi bike?


Hawar ey şaneyê esmanê vekirî..


Hawar ey şahengên mêşên hingiv..

Hawar ey baskên berfê!

Şeş rojan û hemî tişt bi xilqên sipî hatine asê kirin, pişt re hêdî hêdî xanî dest bi henasê dikin, û banên xaniyan bi rêzên reş ên di çeşnê xêzên nivîsandinê de bi reşûşke û cîqan tîn xemilandin. Di nava vê ximava (hibra) Xwedayî ya sipî de zaroktiya me û ya mezinan tevlihav dibe.

Mezinên me li ser zaroktiya xwe dipeyivin, û em ên zarok guhdarî dikin (Hawar ey bêrîkirina ku di berfê de dibişkive!).





Rojekê ji rojan ên mezin jî wek me piçûk bûn. Xwedê giravî wilo dibêjin lê me ji wan bawer nedikir, lê em guhdarî dikin mîna yê ku bixwaze derewa mezin wek pêkenînekê bibihîze:

Ma gelo rast e ku rojekê ji rojan zaroktiya van mezinan jî hebû? Ma gelo bi rastî ew jî zarok bûn? Ew, ewên ku ji bo çavdêriya me hatine jiyane, bi meznahî hatine vê jînê da ku me biqurmiçînin, da ku me kurt bikin, erê ma ne em qurmiçandine û em kurtkirine jî, ma hûn nabînin ku çawan em li hember derewên wan ên li ser zaroktiya ku tune bû surdar û matmayî dimînin. Li ser zaroktiya xwe dipeyivin û ji wan we ye ku em kêfxweş dibin, lê – bawer bikin– ne wilo ye, ew dipeyivin da ku baweriyê bi xwe re çê bikin ku rojekê ji rojan; di demek dojêhî de, ewana jî bûnewer bûn; bûnewrine nerm û bêguneh bûn..

Peyivîna dest pê dike, berî her tiştî li ser zuryanekê ji berfê dipeyivin. zuryanekê ji vê berfa ku me dîtiye girantir e, Navê(Berfa giran) lêdikin. Li vir rûdan û bûyer tevlihev dibin.

Gelek – ji wan kesên ku di parastina reseniya rîzyayî de xwe bi rewîşt û gêwlên perîşanan re şelaf dikin– dibêjin ku gundî dîrok û bûyeran bêyî belge û nivîsandin dizanin. Bêguman hin tiştan dizanin; wek demên şev û rojê. dirêjahî û kurtahiya wan. Wextên baranê û bageran dizanin, herwiha demsalên tovan û çandinê, dikarin sala ku tê de dijîn bi hêsantî bixwînin, lê dema ku hewl didin da ku paşerojê û rûdanên wê vegerînin, tiştên bûyî û nebûyî tîkelîhev dikin, "dê" li tevî "bû" dikin, aniha (hazir) dikin darêjgeheke efsanewî bo rûbarine ji zixurên birê. Lewra "berfa mezin" bûbû bendergeha hemî bûyeran; bûyerê ku berya wê bi gelekî qewimîne û yên ku piştî wê jî.

Mezin dibêjin, ku ji ber seqema dijwar goşt ji ser lingan diweşiya û şehên hesînî yên lingan xuyanî dikirin. Pê diwerimîn û goşt bi zîkê pêlavan ve dizeliqî, û ji ber kêmbûna êm kulekan hiriya hevûdû dixwarin. Dibêjin ku havîna piştî "berfa giran" havîneke zuha bû, lewra xelk ji bêçareyî di rêxa dewaran de li çend lib genim digeriyan. Dibêjin di wan rojan de, "kîrê gê" bi bihayê berê, yê rojên destfirehiyê yê mîhekê dihat firotin.

Em ên zarok jî vê pîrsgirêkê bi mit û matiyêke bêhempa werdigirin: "Kîrê gê?" Dibêjin: "Erê erê ma çî, kîrê gê... mirov piçêkî li ser êgir dibirêje û pişt re du rojan dicû, dicû û tama devê xwe xweş dike wek ku jê we ye ku bi rastî tama birajtinê di devê wî de ye."

Dibêjin û dibilînin: Xelkê pêşî dest bi xwarina mîhan kirin, piştî ku mîh neman dest bi xwarina hesp û qantiran kirin, ku hesp û qantir neman dest bi xwarina keran kirin, ku ker neman dest bi xwarina pisikan kirin. Hinan hew xwarin, hin jî zîk li wan bû heban û çûn, hinan jî jiyana xwe berdewam kirin û dawiya kûçik û gumgumokan jî anîn.

...

Mezin vebêjiya xwe berdewam dikin, em tu tiştî jî zaroktiyê di vebêjiya wan

de nabinin, lewra em di nav berfê de û di paş berfê de li wê digerin; di paş berfê de ku teşiyên bagerê digerin û pemboyê esmanî yê sar dikin qeşa req wek kumê lêşkeran, ku teşiyên zemînê digerin û bûneweran dikin efsan.

**B**i dû rojên berfê de, wexta ku deşt qelişin û ji terkan jiyana mîna serçavka bişkojekê an mîna pinpinîkekê, derçû, li bakurê rojhilat karwanê Mirîdan dest bi serdana mala Şêx Ehmedê Xezna kirin. Mirîdên Şêxê Xezna pir hişk in, wî bi hişkî diparêzin. Li seranserî wê demsalê xelekên zikrê li dar dixînin, wexta ku vedigerin, zikra xwe li malên xwe her berdewam dikin. Ji xwe hergav mala yê herî dîndar hildibijêrin, li wir, wê gavê, em, ên zarok, dikeniyana jî em li ber bûyerê dilerizîn.

Berya ku xelesa zikrê amade bikin, mirîdan, nanê cehî yê ku bi xwe re ji mala Şêxê Xezna anîbûn li hevdu dabeş dikirin, em —ên zarok— jî, para xwe ji bereke-

**“Şikro” ne pir kin û ne jî pir dirêj e, navûser e, pan e, sê kirasan bi ser hev de li xwe dike, di bin kirasan de şerwalekî jî hiriyê û bi ser kirasan de e beyeke qalind jî mûyên bizinan havîn be yan jî zivistan be li xwe dike.**

ta wî nanê hişk bi dest dixînin, daholvan tê (erebana xwe tîne) erebana ku bi xelekên zer ên sifirînî xemilandiye, û hêdî hêdî qesîde û sirûd dest pê dikin, gav bi gav xurtir dibin, da ku hildiperikin darên spîndaran û bilindahiya wan dagir dikin.

Mirîd li ba dibin, serî li ba dibin, peyivîn tevlihav dibe; dibe pitepit û himehim. Rû diqerimin, req dibin, kef bi devan dikeve. Hin ji ser hişê xwe diçin û li bin guhê erdê dikevin û yê mayî diqîrin û dibêjin: “Sir hate me, sir”. Em —ên zarok jî— hêvî dikin ku rojekê ji rojan “sir” bê me, lê “sir” nayê. Em xwe haş dikin û ji xwe re dibêjin: Xuya ye ku “sir” tenê ji bo mezînan e.

Hin ji Mirîdan dibêjin ku Şêxê Xezna bi xwe ji van xelekên zikrê aciz e, lê Şêxê Xezna dikare çî bike, ma ne ev mirîdana bi xwe hêz û desthilatdarî û serfiraziya wî ne?

Bi dirêjahiya du heftiyana xwarin û vexwarinê ji mirîdan re amade dike, pêşwaziya deh hezaran dike, deh hezar serdanvan bi vexwandineke bê mînak rojên xwe derbas dikin. Hergîz kêr li ser stûyên berxan amadekirî ne, hergîz tenûrên nên ji bo nanê cehî sorkirî ne. Ev e karê Şêxê Xezna, ev e karê giranbuhatiyên û destdirêjtirîn Şêxên bakur. Hikûmetên ku mîna kuliyan bi dû hev de tînin li razîbûna wî digerin, êl û eşîr li razîbûna wî digerin..

Herwiha zarok jî li razîbûna wî digerin, çînkî eger sûnd xwarin û sûnda xwe

şkenadin, dê Şêxê Xezna di xewnê de amade bibe, dê destê xwe têxe qirika virkeran, an jî dê qirikê biçiqîne da ku çav beloq bimînin, çendîn car me dibihîst ku filan keso ji xewê çeng bûye, bi hawar digot: "Tobe, Şêx Ehmed tobe"

**M**irîdên Xeznewî pir kevnar in, Tu wan ji ber dikî, tu bizav û rabûn û rûniştina wan ji ber dikî. Em bi xwe jinên ku gelekî di xelekên zikrê de diqirin û yên ku xwe di wexta hatina "sir" de bê hawe dikin pirtir dinasin. Lê Şikro mirîdekî seyr e. mirîdekî pir reng û pir komîk e. Li ser piyan, 90 km, ta ku dighêje mala Şêxê Xezna, dibirre, çiqasî westan pir be wisa jî xêra wê pirtir dibe; ev bawerî ya Şikro ye.

Şikro ne pir kin û ne jî pir dirêj e, navser e, pan e, sê kirasan bi ser hev de li xwe dike, di bin kirasan de şerwalekî ji hiriyê û bi ser kirasan de ebeyeke qalind ji mûyên bizinan havîn be yan jî zivistan be li xwe dike. Hergav darekî dirêj da ku winda nebe bi benekî bi bazinê destê wî ve girêdayî ye. Mereqa wî ku ta û benikan ji kolanan berhev bike. Bêrkên wî bi ta û benikan dagirtî ne, wexta ku di bêrikan de hilnayên wan di şaşika xwe de bi cî dike. Şikro bê kar e, tiştta ku heye li mazûbanekî, li xwarina dawetekê, yan li xwarina jidayikbûnekê, sinerki-rinekê yan jî xwarina mirinekê digere. Carina bi izrê dikeve, wek gayekî tê xwarê û kef bi devê wî dikeve, ku tê ser hişê xwe satilek av vedixwe, av bi ser riha wî yî dirêjî tof de dirije, diherike û dibe mezbûn. Şikro bê mal e. Bi şevê çawan li hev hat wilo radize; li axurekî yan jî li kaviş û xirbeyekî.

Em – ên zarok – jê ditirsiyan, em ji çavên wî yên beq û jî izirkerîna wî ditirsiyan. Lê pîrekan rê didanê – ew yê nêr – ku di xelekên zikrê de tevli wan bibe, "kêm aqiliya" wî ji xwe re dikirin bahane. Şikro çavnerîna vêya dikir, ne tenê wilo, da ku vê lîskê qezenc bike xwe bêaqilîr dikir. Wexta ku yek ji wan pîrekan hêrs dibû û "di nav destên Xwedê de" xwe ji ser hişê xwe dibir, Şikro radi-bû ber bi wê ve û bi hilgirtin ew derdixist derveyî xelesa zikrê, gelek caran hati-bû dîtî ku çawan, ne bi awayê alîkariyê di himbêza xwe de rahiştiye wan, lê bi awayê dîtîrî.

Em – ên zarok – jî, me gelek caran didît ku çawan "ên ji ser hişê xwe çûyî" ne ji alîkariya Şikro, lê ji hêza guvaştina wî dihatin ser hişên xwe; pişt re bi dizî awir tê de vedidan, awirvedanîna ku bi dilbijandîneke nehênî tîkel bûn, ew didan ber çêr û dicûnên xwe û bi çavên xwe li cihêkî rep di laşê wî de temaşe dikirin, Şikro jî dikeniya; wek dêwekî dikeniya û xwe li erdê radimidand.

**H**er û her Şikro mirovekî dilşad û kêfxweş bû, lê di "roja reş" de bû-newerekî rûtirş û tirsayî dixuya. Ma hûn pê dizanin ku "ROJA REŞ" çi ye?

Beyaniyekê em li ser taristaneke seyr ji xewê şiyar bûn, taristaneke qehweyî, tirs û saw li ser rûyên mezinan hatibûn nîgarkirin. Bi rastî jî beyanî ye, lê beya-



nîyek wisa ye ku mirov ji metrekê dûrtir nabîne. Wexta ku em derketin hewşê hindik mabû ku em rêça dergeh winda bikin. Toza şahane; toza cegerdar hemî zemîn dagîrkiribû. Ji camên pencereyan dirijiya, wek tîrêjên tavê camên pencereyan derbas dikir. Wexta ku em ji xewê şiyar bûn di nava livînan de bi me re razayî bû; di nava cilûbergên me de bû.

Kurtepistan dest pê kirin: "Nişana qiyametê ye." Mezinan destnimêjgirtin, dîwar bi dîwar; bi rapelandin xwe gîhandin mizgeftê, me jî da dû wan, wekî wan; dîwar bi dîwar û bi rapelandin me xwe gîhand mizgeftê. Kor in û koran bi dû xwe de radikişînin. Li ber dergehê mizgefta mezin hemû zilamên taxê civiya bûn. Bi berzûrî û bi kurtepiştî li alî rojava temaşe dikirin û digotin: "Dê ji vir hilê".

Ji bo me zarokan lîskeke seyr û nuh bû, bi tirsek piçûk dest pê kir û hêdî hêdî bû bendewariyeke rastîn bo hilatina rojê ji alê rojava de.

Piçêkî toz kêmtir dibe, îca em dikarin xaniyên li wî rexê dîtir ji kolanê bibînin. Lê metirsî ew metirsî ye: Şikro di nivê kolanê de diçe û tê, wexta ku berê xwe ber bi esman de vedike û diqîre: "MEDED XOCA... MEDED!" darê wî ye ku di bazinê dest de, bilind dibe. Yên mezin bi ser de radibin: "Şikro bîna xwe fireh bik lao", wê gavê Şikro ber bi melayê ku li ber dergehê mizgeftê rawestiyayî ye bazdide, xwe davêje bextê wî û destên wî maç dike, bi hêvî û lavilav li rûyê melê temaşe dike. Melayê ku îmam e dibêje: "Tirs li ser xwedênasan nîn e, tirs li ser wan nîn e".

Em bi xwe nizanin çima li ber dergehê mizgeftê rawestiyane û derbasî hundir nabin, lê bi çend kurtepistan em piçêkî haş dibin: "Mizgeft dê parêzgeha dawîn be" ... Ne xwe metirsiya dawîn a dê ji bêcareyî me bavêje mizgeftê; hê jî; nehatiye. Em hinekî bîna xwe berdidin, lê gava ku em navê "Decal" û "Yacûc û Macûcan" dibihîzînin; careke dî em bêhna xwe digirin. Dê bûnewerin bên; bûnewerine bi rih, bi dirêjahiya destan in, nan û hesin dixwin... Bûnewer in û li ser kerekî kor mirovekî kor serkêşiya wan dike, hemî Xwedê nenasên cihanê hevalbendiya wî dikin, piraniya wan jî jin in. Dê jin, rût, li pêşiya wî bimeşin da ku xelkê bixapînin, û nişana hatinê jî ew e, ku roj ji alî rojava de hilê.

Ne xwe taristana mizgînîdar ev e, ne xwe ev toz toza sûra ku herifiye, sûra ku Xwedê li dorhêla Yacûc û Macûcan avakiribû da ku asê bimînin.

Şikro ji îmam re dibêje: "Ez dê wan bi darê xwe vegeřînim", îmam lê vedigerîne "bitebit, bîna xwe fireh bik."

"Ez dê çavên xwe girêbidim da ku jinên rût min nexapînin", Şikro ji îmam re dibêje.

"Bitebit, bîna xwe fireh bik", îmam lê vedigerîne.

Ji nû ve Şikro dest bi bazdanê dike, di nivê kolanê de diçe û tê, berzûrî esman dibe: "MEDED XOCA... MEDED!"

Nîvroj e; toz ji ser erdê bilind dibe. Form mîna ku ji deryaçeyê axîni derçû



**Mezin dibêjin: Ku ji ber se-qema dijwar goşt ji ser lîngan diweşiya û şehên hestî-nî yên lîngan xuyanî dikirin. Pê diwerimîn û goşt bi zikê pêlavan ve dizeliqî, û ji ber kêmbûna êm kulekan hiriya hevûdû dixwarin. Dibêjin ku havîna piştî "berfa giran" havîneke zuha bû, lewra xelk ji bêçareyî di rêxa dewaran de li çend lib genim digeriyan. Dibêjin di wan rojan de "kîrê gê" bi bihayê berê yê rojên destfirehiyê yê mîhekê dihat firotin.**

bin dixuyin. Xelk li jor temaşe dikin. Roj; ji paş temeke tarî, wek kulorek sor î xav, di nivê kumê esman de, diyar dibe. Mezinên me dudil dimînin: "Roj di nivê esmên de ye! Ma gelo ji rojhilat an ji rojava derçûye?" Piçekî sebrê dikşînin da ku bizanibin ka dê bi kîjan alî de serxwar bibe. Lê Şikro natebite. Şaşika xwe davêje erdê û dike hawar: "Ji alî rojava derketiye, ji alî rojava ye... Meded!" Ji nişkê ve bi izrê dikeve, wek sûra herîfî ya Yacûc; xwe li ser keviya kolanê dirêj dike.

Piştî çend kêlikan şaşitiya baweriyê, ya pîvanê ron dibe. Qiyamet, hatiye bi şûn de xistin, wêranbûyîna gerdûn hat bi şûn de xistin, gerek ev zemîn çend serdemên dîtir jî barê xwe hilgire, gerek miriyan û dek û dolabên wan hilgire, jîndaran û dek û dolabên wan hilgire. Li vir; mezinên me ji ber dergêhê mizgeftê bela dibin, em ên zarok tenê dimînin, wextekî pir dirêj derbas nabe; em bi dû pezê "Hemdan" ê şivan de dibezin. Hemdanê ku wê rojê, cara pêşîn, piştî sîh salî ji zû şiyarbûnê; hinekî dereng ji axurê xwe derketibû.

**Ji bilî "Hemdan" ê ku piraniya şevan wî di axurê xwe de dihêwirî-**

ne wek ku em dizanin, hevalên Şikro nîn in. "Hemdano" çel salî ye, li rojavayî bajêr şivantiya kulekên birayê xwe yî goştîroş dike. Birayê HEMDANO jî wek heqdest; xaniyek jê re avakiribû; xaniyekî nizim, yek ode, û hewşek bi kelpîçan rapêçayî; Hemdano û kera xwe ya mê û kûçikê xwe û çend kavir tê de radizên. Pişt re Şikro jî tevî wana dibe. Ji xwe hewşa mezin xawenê (milkê) pêz bû. Lê hevalbendiya herdiwan pir dom nekir çinkî Şikro nehênî û razên (sirên) destbirakê xwe nediparastin.

Hemdanê sêwî di bin perrên birayê xwe de mezin bûbû, birayê wî jî, ji piçûkaniya wî de şivantî spartibûyê, mezin bû; bêyî ku— ji bilî navan— tu tiştî ji xelkê û ji bajêr bizanibe, cîhana wî meydanek e, tenê têra sed mihî dike. Bi tenha xwe dijiya, Şikro jî razên wê tenhatiyê neparastin: Li ser peywendiyê seyr di navbera şivên û kera mê de dipeyivî, herwiha li ser peywendiyê seyr di navbera

ra şivên û kulekan de dipeyivî. Mezinan ling ji ber ŞIKRO dişemitandin da ku bi hûrbînî wan peywendîyan şirove bike, wî jî tu tişt jê bernedida. û digot:

HEMDANO bi şevê radibe ser xwe, kera mê dixê koşeyekê û wek zilamê ku li pîrekê siwar be lê siwar dibe. Yan jî li ser gidîşê bazdide ser mihan.

"Hemdano" ji navbidûxistina Şikro tore dibe, lê birayê wî li herdiwan bi tundî tê zezebê. Da ku devê xelkê bigire û qalûqilan bibire, biryarê dide ku jinekê ji birayê xwe yê şivan re bîne.

Hezar lîreyan qelenê keçeke zarok î sêwî, yazeh salî, dide, û li birayê xwe mehir dike. Bi rastî jî zarok bû, ji me-ên zarok- re bi kawikî digot: ku çawan eger ji HEMDANO re nehêle lédide, ku çawan kirasê wê bi zorê jêdike; wek ku ji xwe re pîvazekê biqêşere, û ku çawan destê xwe yî qalind datîne ser devê wê da ku tu kes qîrîna wê nebihîze... û çawan...û çawan... Em ji ber vê seqayê(atmosferê) dilerizin-Em ên ku wê dikişînin peyivînê- Em ji ber vî şivanê şeytan "Mê-rê mîhê" dilerizin.

**Tu tişt ji dest me nedihat-em, tovên bakur-ji bilî ku** em ji terk û qelşan derkevin û radestî bahoza tirsê bibin. Tirs, tirs, tirs, tirs. Bi tirsê zemîn dest pê dike û bi tirsê jî kuta dibe. Her bi wê tirsê; bi wê sergêjahiya ku tirs hinavên mirov pê dinuxumîne, her bi wê; gerek em berdewam bikin, di nivê wê stêrka ji hawar-hawara bêdeng a jina HEMDANO gerek em berdewam bikin; hawar-hawara ku her û her berfirehtir û kûrtir dibe. Hergav em dikenîyan, em ji ken dilerizin, em bi lerizin dikenîyan. Em dê çawan nekenin; em dê çawan bi vê dîmena ku xortek di tengerêyan de bazdide û xelk bi peyketine nekenin? Ma hûn dizanin çima bi peyketine?

Di şeva pêşin de, wexta ku derbasî cem bûka xwe bûbû, wan rûreş kiriye, erê... wan rûreş kiriye, lewra aniha wek le` netlêhatikî bi pey wî ketine.

Bavê BEYREM ji "Beyrem" re bûkek di temenê wî de anî (herdû çaredeh salî bûn), bi def û zurnê, da ku zilamtiya kurê xwe destnîşan bike heft roj û heft şevan erd hilanî û dananî. Şevêkê ji wan her heft şevên kernevalê, kurê xwe dehfda odeya bûkê; odeya ku bûk tê de ji alî pîrekan ve hatibû amadekirin, wî jî; bi bendewaran re bendewariya kurê xwe kir, da ku derkeve û ala serkeftinê di destê wî de li ser perdeya xweşiya ezeli bilindkirî be.

Bendewariya bavê hetanî destê sibê ajotibû. Wê wextê jinên ku bîna wan teng bûbû êrişî cihê bûk û zavê kirin. Bibazdan, bilez li bûkê nêrîn lê bûk wek xwe bû, gençineyeke her bi wê xilqê asêkiriye. Bi qîrîna wan re lawik tirsîya. Ew ji porê wî kişîşandin: "Nemêr e". Lawik hêdî hêdî xwe ji nav destên wan rizgar kir û revîya, zarokên bêcir û merivên ku rûreş bûbûn û ku dê çend rojan rûyên xwe ji ber xelkê veşêrin, bi peyketin. Em- ên zarok - dikenin, em bi lawikê bextreş dikenin û em jî tevli xelkên ku bi pey ketine, dibin. Wisa, bê agahdarî em dijminatîya xwe eşkere dikin. Di dawî de bêyî ku em ji sezayê bitirsîn; ji bo





tolê, me ji xwe re yek dîtiye. Em kevirên mezin hildigirin, bi qasî ku kulma me bikaribe em axê hildigirin û em li bin guhê lêwîk dixînin.


Em di tohîlanîneke bê sedem de kûr dibin, em di naskirina zikreşîya xwe de ya li ser bûnewer, kîjan bûnewer be, kûr dibin, û wexta ku em diwestin û em nikarin wî bigirin, em wî didin ber çêreyên tal, em vedigerin wî cihê ku kurte-pistekte seyr jê derdiçe: "Ma ji wî kûçikî re negotibûn eger mêranî jê nehat bila bi destê xwe bixebite?.. Tiftî". Em ji hev dipirsîn: "bi destê xwe?" lê em tu angoyê (me`nê) jê re nabînin. Ma ne dest ji bo xwarin û lêdan û diziyê û ji bo lîska xaran e. Lê wa dixuye; ku mezin tiştine dîtir; ku nakevin bîra me de; bi destên xwe dikin.

Ev bûyerana di demeke bûrî yî pir seyr de qewimîne, demek bû, bi ser serên me de; tozek; ji ardekî esmer û ji tîpan û sifir û ji bêbextiyên mîna rehên mêkêkê şêrîn, direşand. Demek bû, wek hemî demên bûrî yên zemînê, ne ji me re bû. Lê belê yên wek me şikestî guh nedidan şikestineke nuh, tu kesî jî nikaribû tiştê ku li bal me nîn e ji me bistîne. Ji ber vê yekê me derzî xistin nava êmê çêlekên "Sîrop". Û me sikrên avê bi ser bexçeyên "Gerebêt" de vekirin hetanî di bin avê de winda bûn, û me berê xwe da veşartgehên xwe da ku em bikaribin bi şevê, talana xwe berdeyam bikin, talana ku me nikaribû bi rojê bikira. **D**





**D**i vê hejmarê de, em dixwazin helbesta hevalbend û dostê gelê kurd Selam Sadiq pêşkêşî xwendevanan bikin.. Selam Sadiqê ku birêveçûna ezêlî ya xweîfrenge a Mîdiyan di helbestên wî de dibîşkive. Ku bi dilekî erebî êşa kurdan dinivîsîne.. Bêguman helbestvanên Ereba ên ku bi vî awayî danûstendinê bi trajedyaya gelê kurd re dikin pir kêma in, eger hat û peyda bûn jî; piştî demekê (ji bilî helbestvanê mezin Sadî Yûsif) nema li helbestên xwe xwedî derdikevin.

Selam Sadiq jî bajarê Bexdayê ye.. Li çiyayên Kurdistanê jiyaye û ji wan çiyayan hezkiriyê. Anuha romansê ku bi qirkirin û wêrankirina gelê kurd rapêçayîye têt bîra wî. Li Spanyayê, çend salan sergerdan û bêwar jiyaye, jî çend salan û vir de li Swêdê nexweş... bêzar ligel kul û derdên xwe û bîranînên Kurdan dijî.. Sê pirtûkên wî yê helbestan hatine çapkirin û anuha li ser nivîsandina romanekê dixebite û di romanê de li ser kulîkên Kurdistanê û hevalên xwe yê Kurd dipeyive. Li ser kulîka Loloyê ya rojekê jî rojan radestî jineke Kurd kiribû dipeyive. 


## Loloyên Adarê


Di daran de şehîna adarê ye  
 Deng jî gupîtkên çiyê dibare  
 Di dilovaniyê de çamçiyên sosretê birûskan vedidin  
 Hespên wê, li geliyan, zikreşiyêke kesek diçînin  
 siwarên wê Kurd in, pêxwasên gulana  
 di gumanên şîlanana de û di belkoyên xwîneke şahîk de





ku stêran kedî dike, winda dibin  
Adar nayê, bi xwarî têt

Gaberdan bi rengan dadide  
Wek şîravê di arezûyên kilê de dihêwire  
Bi evîna çavkaniyan serxweş dibe  
Bi leşkeran dikene  
Leşkerên ku bi angoya veşartî ya demsalan dikenin  
Xefkên wan, li jor vedayî bûn  
Li ber balendeyê aza û li ber tîrsê û xwezayan vedayî bûn  
Dergeh bi volkanan avis in  
şermezariya dema dorpêçkirî agirên wan  
û gavên gulreng ên zarokan, dişo  
Kî dê pirtûka evîne li ser ewran veke?  
Kî dê pirtûkê şanî bagera rastiya qizane bike?  
Da ku belgan ji nû ve bîdîline  
Ji bilî mîletê ku jîyan ji bo dema têkperînan amadekirîye  
Ji bilî mîletê ku  
miriyên xwe li ser asîtankên asoya bilind bi oxîrkirine  
û di taya serdeman de, di dojecha hêviyê de bi cî bûye, di angoya axîne de  
kûrtir dibe;  
û di xwîna ku ji milên (pîremegrûn) diherike jî  
Mîletê ku xwîna Qulingên revend li wan vedigerîne û li dilê çîyan, tundiyê û  
nazîkbûna arezûyan, vedigerîne  
Adar bi gavên piçûk î çelmişî dizivire  
bi kolanan re dilsoj bû  
Henasa Newrozê ew xapandibû  
vegeriya, da ku li ser gupîtkî çîyan bîna mirîne, û li deştê şîniyê, di dilên  
Kurdan de; tarûmar bike. 




## Mîdya, bixûrê bişewitîn!

Ez dê bejna xwe diyarî te bikim  
 û mistekê ji şermezariya xwe ji  
 Ez dê tîrsa xwe pêşkêşî te bikim, tenhatiya xwe ji  
 Ez dê serê xwe li bin baskên dengê te deynim  
 Ez dê di sîbera tiliyên te de binivim  
 Tu berbejna aramê, li ber serê min, dihêli  
 û tu ji esmanê min stêrkan berhev dikî da ku  
 îro jî derbas bibe  
 Tu yê şîniya min a ku  
 bi ava rûyê te şûştiye; bibinî  
 Dê temenê min dermanê neynûkên te be  
 Xaçê bişîrîna te hildigirim  
 û tobedariya xwe radigihînim  
 serjêkiringeha lêbûrîna te  
 Gazî Iskender û Rewşenê dikim  
 wan pîroz dikim  
 û li bin sûrên Erbilê bazdidim  
 û di tengerêyên Diyarbekirê de  
 Xwe digihînim jîbermayên çîrusîna te  
 Li ber taca xewna te diçemim  
 Bîna toza destê te bi xwe wêrdikim  
 Ez dê ji welatekî xemgîn bêm  
 bi dîroka xewnan û bi serdema stîranan nixuman-  
 di me  
 Ez dê li dergêhê sirûda te bidim  
 Ez dê bend û ayetan ji bo lingên te bixwînim  
 Ez dê kelehan ji nava destên te vekim  
 Ez dê gazî şahînşahiya Medya bikim

û ezê bixûrê bo Anahîta bişewitînim  
 Tu di gerdeniya xwe de  
 sîbera min hildigiri  
 Tu baskên xewnên min vediki  
 Tu anîha ji min rût dikî



Tu rojê li ser bendmana min belav dikî  
 ji reva xwe direvim  
 û bang dikim:  
 Medya... Ey Şahînşahiya Şahînşahiyan  
 De rêça sînga xwe ji bo min serbest bik  
 De çavdêriya karwanê min bik;  
 dema ku di ber dergêhên imperatoriya te re bibu-  
 hurin  
 Ji îro û pê ve dê Korş min neşikîne  
 Şahînşahiya min nahefirîne  
 Tu şahînişîniya min î. 10




## Taştê

Qehwe valakir fincanê.  
şîr li tevî qehwê kir,  
Şekir xist nav  
qehwa bi şîr  
Bi kevçiyê piçûk lihev xist  
Qehwa bi şîr vexwar  
Fincan vegerand şûna wê  
Bêyî ku bi min re bipeyive  
Cigareyek vê xist  
Bi dûyê çend xelek çêkirin  
Xwelî xist xwelîdankê  
Bêyî ku bi min re bipeyive  
Bêyî ku li min temaş bike  
rabû ser xwe  
Kumê xwe da serê xwe  
Paltoyê zivistanê li xwe kir  
çinkî baran dibariya  
Peyvek negot  
û di bin baranê de  
çû  
Min jî  
serê xwe xist nav destên xwe  
û giriyam..

**JACQUES PREVERT**



## Taha Xelîl, helbestvanê giyanên mişext û dengê dengvedana bêdeng û dereng a axînan



Taha Xelîl, Luqman Dêrkî, M. Eflîf Huseynî û hinin din nexşeya helbestvanên kurdên erebînivîs ên nîfşê salên heystêyî nîgar dikin. Di cihana giştî ya helbesta

Erebî de û bi taybetî li Sûryayê, di kovar û rojnameyan de, û li ser depreşa helbestê wek helbestvanine nûjen tên nasikirin.

Bêguman ezmûneya van helbestvanên Kurd rengêkî taybetmend werdigire û helbesta erebî jî bi rengê wê ezmûneyê têt xemilandin ango şûnşopa xwe, çêja xwe, li ser dimênên giştî yên helbesta erebî li Sûryayê dihêle.

Yek ji wan ezmûneyên balkêş ezmûneya dahênane ya Taha Xelîl e.

Di helbestên T. Xelîl de tiştên veşartî û qedexeyê nîn in, lixwemikurhatineke reha û herikîneke bê sînor û bê raz, bê çiv û bê xapandin e, mirovê xwendevan dikare kûrahiya helbestan zefî bike. Lê zefîkirina hinavên helbestê yan jî çameyê (qesîdê) şiyanekekê, aramekekê, û bînfirahiyekekê dixwaze, çunkî T. Xelîl bi hûrbînî li ser alavên derbirîna helbestî radiweste û di avakirina

helbestên xwe de wek peykertaşekî dixebite, bi şarezayîyêke bêdudilî yê xwendevan radikîşîne taybetmendîya xwe, bêje, wêne, ritm û ne-wa û mebesta xwe:

Do, min berçavka xwe li firoşgeha cilûbergan jî bîr kir..

Îro, wexta ku ez vegeyîyam wê firoşgehê bi xwe, Wê koşeyê bi xwe..

Li paş camên berçavkê.. Du çavên xemgîn digirîyan!

Wisa T. Xelîl hewldide ku dengê xwe, ku tevna xwe, ku awayên derbirîna dilsojane û rasteqîn bo helbesta xwe, damezirîne. Herûher helbesta xwe jî bend û merbend û çeperan rizgar dike, da ku me bigihîne tixûbê surdarî û matmayîne, ne ku tenê teknik û form û huneriya helbestê; lê di naverok û ango û avahiya dirûnî ya çameyê de, da ku jî me re herdû aliyên realîteya jiyana me berbiçav û destnîşan bike. Di jiyana me de spehîtî û kirêti, têkçûn û serkeftin, reş û sipî, xweşbînî û reşbînî hene, lê T. Xelî hewldide

ku bi raybetmendiya xwe yî hunerî van hev kêşên (Mûadeleyên) nakokane berhev bike:

Te zersosinek ji me re nehişt..

Te şaxek ji me re nehişt..

Da ku em bavêjin ser gorên xwe..

Da ku di tenhatiya axê

Û taristanê de

piçekî... Sebra me binin!

Taha Xelil her gav di helbestên xwe de wek Kurdekî xemgîn û dilşikestî danûstendinê bi cihanê re dike. Armanca wî ronîkirin û çesipandina mirovatiya mirovê Kurd e. Evîna wî her gav evîneke çiyayî ye, werista wî werista çiya û barûdê ye, jinên wî bi dîmen û hinarkên çiyane û koçerane bi şermezarî û bi bişirînên tir-

"Erê keça min..

Zilamek ji hesinê xwe rabû..

ba zeft kir, bi dû xwe de kişîşand..

Bi xencera xwe zikê esmên çirand.. Esman bariya..

Kurdek bi dirêjahiya dûmana xwe rabû:

Me navê wî kir KAWA em ên ji kevokên xwe serjêkirî, zilamek hat û em dadan, zaroktî û sirûd avêtin nav êgir, çiya bi êgir piroz bûn, wê rojê Hemrîn, Agirî, Şêrîn, Piştko, Şengal... Hejîrên xwe dadîweşandin, zilamên zuha hildiweşiyên, zemîn hildiweşiya, hendeseya peyivînê, giranî û hilperikîna Lavlavê hildiweşiyên"

Di pirtûka xwe yî dawîn Koreqiral de, T. Xelil dixwaze sînorên hilweşyayî yê di navbera qonaxên kul û şîniyê de, ji me re, hem pêşkêş bike, û hem jî, kilitên belkoyên guherandina cî-


## Armanca Taha Xelîl ronîkirin û çesipandina mirovatiya mirovê Kurd e. Evîna wî her gav evîneke çiyayî ye, xurista wî xurista çiya û barûdê ye.

samêz amade dibin, dar û çûk û bager, mirin û eşq û zindan û gritîxane û leşker û gaza xerdelê û dagîrkerên hovane ku laşê nerm û şahîk û step ê welatekî dilovan û dayikane bi pêlavên serbazên xwe ji destnimêj dixînin. Di vî warî de T. Xelil bêcir e; bê rêz û bêrû ye, her tiştî ron, eşkere û zelal dibêje, bêtî ku helbesta xwe rakîşîne meydana silogan û durîşman û pesindana bêkêr; bêtî xwepêşandan û badana simbelan tiliyên xwe darîne ser koka birînê û bi berfîrehî hestên mirovane yê kurdên sedsala bîstan derdibire, da ku di serencama dawîn de bi alavên xwe yê hunerî beşekî ji trajedyaya gelê Kurd berceste bike; bigewde bike; trajedyaya ku ji bo wî, wek helbestvan û wek rewşenbîr, xala bîngêhîna ya derbirîn û afirandinê ye:


hana rûreş bi alî piçek azadî de, wek sîberine req, ji me re destnîşan dike, dixwaze paşeroj û pêşeroja tiştan û bûneweran ji me re wek arezû û têramandin û amaje bilêv bike, da ku em bikaribin cudahiyê têxînin navbera mirin û jiyane, da ku em bi xwe jî bikaribin wan nakokiyên ron bikin; ziman û jiyane, xewnê û têkçûnê, ken û girî, evîn û zikreşiyê li hevûdû biguncînin, û em ji xwe re; di pêvajoya zuhabûna sext de, wek palpiştan, ji bo têgihîştina helbesta pirango, damezirînin.


Di vê pirtûkê de helbesta Helebçe mîna sirûdeke bê kurayî diherike, di navbera dastan û îstgehên dîroka bêbext de, di navbera pîrozmendiya kulîlkên çiyayî û barîna toza jehrewî de, di wê kélîka lal û bêziman de, helbest dibe

raman, huner, sosret, çarenûs, roman, çîrok û socdarî, tawan û rûvedaneke gawirane, hemî sinc û prînsîp û îdyolojî û rêberî û bend û teorî di xirecira gaza xerdelê de rût dibin; bêrûmet û riswa li ber dergehên mirovatiya bêmirovahî gemkirî û radest li wêne û dimenên kuştin û helalkirina xwîna Kurdan temaşê dikin. Di renckêşanê de pirsên T. Xelîl pirtir dibin û ji mirina xwe dîsa vedigere, da ku bi bêdengîyeke serhişk danûstendina xwe bi cîhanê re, bi ger-

dûn re, bi çîyan re, bi jinan re, bi şîniyê re, bi Gola Simoqiya re, bi Eysana Elî re, berdewam bike. Bi dengê xwe yî birindar hildiperike asoyên bêreng ên xewna xwelîrengî, lê di nav pêlên sosreta bêminak de, dengvedana deng dereng û lawaz digihêje kenarên birîna pîrozmend. Lewra T. Xelîl bi tenha xwe li gel têramandin û pûnijandina xwe digunce û dîsa bi tenha xwe di tengerêyên xewnê de pêrgî sawa helbestê dibe. 

- Taha Xelîl di sala 1961 ê de li dorhêla Qamişloke li gundê Xeznayê ji dayikê bûye.
- Di navbera salên 1981– 1987 an li zankoya Şamê zimanê erebî xwendiyê.
- Dîwana xwe ya pêşîn bi navê "Berya derbasbûna şîniyan" di sala 1988-an de çap kiriye.
- Di dawiya sala 1994 an de pirtûka xwe ya diwemîn bi navê "Koreqiral" li Beyrûte weşandiye.
- Helbestan bi zimanê kurdî û bi zimanê erebî dinivîsine.
- Gelek helbestên Taha Xelîl ji alî sazband û dengbêjên Kurdistanê Sûryayê bûne stiran; wek dengbêj Selah Osê, Koma Armanc û Koma Narin.



- Helbesta Taha Xelîl "Meke girî û melorîne" bi deng û saza hunermendê nemir Mihemed Şêxo hatiye stiran.
- Dîwana Taha Xelîl a bi kurdî bi navê "Şilêr" ji çapê re amade ye. 



# "Ma ne biraderê me nan pê ve daye û her tişt xelas bûye!"

*Pirtûka te berî çend mehan bi navê Koreqiral derçû, di vê pirtûkê de te xwestiye taybetmendiya xwe kûrtir bikî, ma gelo te hemî regezên ku bi-karibin alîkariya damezirandin û çesipandina helbesta Taha Xelîl bikin, bikaranîme?*

– Ma bi rastî pirtûka min awayek e ji awayên kûrkirina taybetmendiya helbestî; ez bi xwe nizanîm, nemaze, dibînim ku gelek helbest di pirtûka Koreqiral de hene gerek min ew neni-vîsandana û di pirtûkê de belav nekirana.

Piştî ku çapkirina pirtûkê hat qedexekirin, li çapkirina wê gurtir bûm. Berpirsyarên xwendina pirtûkan di dezgeha yekîtiya nivîskarên Ereba de bi van gotinan bersiva min dan "Ev pirtûk bilindgoyên helbestî ne ji xelkîna re ku kêfa me ji danûstendina bi wan re nayê, bi şifra hatine nivîsandin!!" Dema ku min ev hevok xwend min ji xwe re got ku bi tîpine ji şîr bin jî ez dê vê pirtûkê çap bikim. Piştî du salan min bi rastî çap kir. Weşanxaneya ku min pirtûk lê çap kiriye jî; digel ku li Beyrûtê ye û ne resmî ye, çinkî ez ne li wir bûm; hin destdirêjî li ser naveroka pirtûkê kiriye.

Lê dawîya dawî hat weşandin. Dîsa li Sûryê careke di biryara qedexekirina kirin û firotina pirtûkê derçû. Li hemberî vê êrîşa hovane rade-dest dimînim.. Ez nizanîm çi di pirtûkê de he-ye ta ku wilo jê ditirsin.

Helbesta ku xelkê bitirsîne yan gelekî eşkere

ye yan jî pir giranbuha ye, lê ez bi xwe bawer nakim ku helbestên min ên di pirtûka nuh de gelekî giranbuha ne, lewra da ku helwestên wisa hovane bîn stendin dê helbestên pirtûkê hinekî zelal û eşkere bîn.

Bi herhal, di pirtûka xwe de min xwestiye ku guncînekê têxim navbera sewiyeta hunerî û ya hişyariyê de, nizanîm hetanî kîjan sînorî biser-ke-time.. Ji mîlekî din ez bawer im ku helbestên vê diwanê dê nema dúbare bibin çinkî zelaliya îdyolojî ya ku jê nefret dikim gerek nema di helbestên min de dúbare bibe.

Di nivîsîna xwe de, xwe dispêrim mîrata wê-jeyî ya ereban lê bingeha nivîsandina min mî-rat û keleporekê û çanda kurdî ye. Ji xwe li vir; dudilî û guman di hin helbestên min de, dest pê dikin; helbesta Helebçe wek nimûne. Di dawî de, pir zor e ku ez bigihêjim çameya (qe-sîdeya) Taha Xelîl wek ku tu bi nav dikî.

*Hûn, nivîskarên Kurd ên ku bi zimanê erebî gi-yanên xwe derdibirin, hûn xwe di asteng û labî-rentê de dibînin an na?*

– Li vir ez dê li ser ezmûnêya xwe bipeyivim. Nivîsandin bi xwe mezintirîn asteng e ku giya-nên me di nav diranê wê de tîn hêrandin. Ma gelo tu çawan dibînî, ez bi kurdî dixum, dî-pe-yivim, xewnan dibînim, bi kurdî radizem û şî-yar dibim, bi ser riyan dikevim, dûr dikevim,

bi kurdî bêcîriyan dikim û bi kurdî hez dikim, lê bi erebî dinivîsinim. Ma gelo ev ne asteng û labîrent e, Lewra carcaran tu dibînî ku ez bi kurdî dinivîsinim, çinkî ez hest dikim ku çiqasî di zimanê erebî de şareza bim û çiqasî bikaribim bêjeyên zimanê erebî bikarbinim, di dawî de dê nikaribin bigihêjin kûrahiya giyan. Giranbuhatîrîn helbesta ku bi erebî binivîsinim dê li hemberî vê stirana kurdî (Ne li vir im ne li wê mo) bê nîrx û ne tu tişt be.

Ez dê tu carî ji zimanê kurdî yê ku min bi şîrê dayika xwe re vexwarîya bi şîrvenebim. Ji ber vê yekê ez gelek caran di helbestên xwe de wişeyên kurdî bikartînim; reng e di deqê erebî de ji bo yê xwendevan hinekî bel û bêkok be jî,

Ez naxwazim bi derewan li ser vê rewşê hêşran bibarînim. Pêla zimanê erebî hetanî radeyekê em li ber xwe birine. Di gel ku ez xemgîn û tore me jî lê gerek em li xwe mukur bîn. Ma gelo ezê rojekê ji rojan tenê bi kurdî binivîsinim.. Ez bi hêvî me. Nivîsandina bi kurdî berpirsariyêke giyanî, netewî û mirovî ye gerek em tev hewlbidin. Lê kînga, ez bi xwe ji nizanîm!!!

*Di navbera te, yan jî cudahiya di navbera ezmûnêya te yê helbestî û ya nivîş te de, ji Kurdên ku bi heman zimanî dinivîsinin, çi ye. Mebesta min ji cudahiye, têgihîştina bizava nûjen a helbesta erebî, û bi gewde kirina trajîdya gelê kurd e ?*

– Ez nikarim bersiva vê pirsê bidim. Lê ez dixwazim li ser xalekê bipeyivim:

Gerek em yê ku bi erebî dinivîsinin hilneperikin nêrdewanên helbestvanên Erebi. Gerek em ji xwe re rêçek cihê, şêwe û awayên derbirîneke cihêwaz bibînin, yan jî serî de pêwîst nake ku em binivîsinin. Kurdê ku bi zimanekî biyanî dinivîsîne gerek nivîskarekî taybetmend be. Gelek Kurd bi erebî dinivîsinin lê rewşa

wan pir xerab e, di navbera dûbarekirin û pitepit û bilindgoya siyasî ya vala de windabûne. Di vî warî de, mamostayê herî mezin Selîm Berekat e. Gerek em giş jê fêr bibin. Selîm Berekat mamostayê Erebi û Kurdan e.

*Hêviya ku nivîskarê Kurd vegere bi zimanê xwe yê zikmakî binivîsîne heye, eger daxwazêke wilo peyda bibe, tu nakokiyê tê de dibînî?*

– Wek prînsîp, di daxwazêke wisa de nakokî nîn e. Di destpêkê de min gotibû ku nivîsandina bi kurdî berpirsariyêke mezin e. Li vir ez dixwazim xewnan û xwezayan û ûtopiyayê deynim alîkî û bi awayekî eşkere û ber bi çav bipeyivim, ez dipirsim: Cîgir yan jî alternatîv li ku ye; mebesta min, wek nimûne, ma gelo kovareke kurdî peyda dibe; kovareke ku hêja be da ku; dîsa wek nimûne, Selîm Berekat dev ji nivîsandina erebî berde û di wê kovarê de bi kurdî binivîsîne? Ez bi xwe tu carî bawer nakim!!

Kovarên edebî yê ku îro li ber dest in, ji alî çend sextekar û çend nezanên ku xwe li paş navên balkêş vedişêrin wek "Redaksyon" û "Xwedî û berpirsare giştî" tên weşandin, nivîsên wan redaksyonan û wan "xwedî û berpirsare giştî"; di rewşêke tendûristane de; di koşeya "Nameyên xwendevanan" de dikarin bîn belavkirin û bîn xwendin.

Helbestvanekî Kurd ku min pir jê hez dikir, min çend helbestên wî yê pir xweş xwendibûn, vê pêla dawîn wisa dibêje:

"Celadet Bedirxan bi Hawar-a xwe tenûr dada  
û Ferat Cewerî bi Nûdem-a xwe nan pêveda"

Dema ku ez peyvên wilo dixwînim, ez ji xwe re dibêjim: Tu gelekî dereng mayî, tu yê ji nû ve çawan li nivîsandina bi kurdî vegeerî?

Ma ne biraderê me nan pê ve daye û her tiş

xelas bûye!

Îca em çi bikin!! Reng e tu ji min re bibêjî: Hûn dê ne ji bo wan kesan binivîstînin. Ez dibêjim: Belê, çinkî gerek ez nivîsên xwe ji wan kesan re bişînim da ku belav bikin û biryara weşandinê di destên wan de ye,.. Eger ez pirtûkekê çap bikim gerek ew nezanên ku pêwîst nake navên wan bibêjim – çinkî ez ditirsim ku dêwekî dîtir wek Siyamendê İbrahim derkeve û xwîna min helal bike– biryara çapkirina wê bidin.

Ma gelo alternatîvekî dîtir heye da ku nivîskarê Kurd vegere zimanê xwe yê zikmakî? Pirs ev e...

Her yek ji me hinek egoyîstî bi xwe re hiltîne, em dixwazin helbestên xwe belav bikin, em

Ez bi xwe rewşa Kurdan û rewşa zimanê kurdî têdigihêjim, tenê bi mercekî ez dikarim bi kurdî binivîstînim ew jî ev e; gerek yekî nezan awayê nivîsandin û têramandina min rast neke, gerek sekreterê partiyekê xwe wek sekreterê helbestên min jî nebîne, yan gerek xwedî û berpirsyarê giştî yê vê kovarê û wê kovarê xwe wek xwedî û berpirsyarê helbestên min jî nebîne. Pêwîst nake ku em ji hevdu veşêrin; îro di cîhana çanda kurdî de çend komik û girûp çêbûne, bi awakî nav bi xwe xistine, xelkên Kurd ew naskirine, ma ev kesana dikarin li ser cihên xwe di cîhana aferandina rastin de bi me re rûnên û guftûgoyan bikin!? Ma gelo em dikarin ji wan kesan re nezaniya wan ron bikin, ma ew bi xwe jî dikarin li xwe vegerin da ku şîyan û

**Gerek yekî nezan awayê nivîsandin û têramandina min rast neke, gerek sekreterê partiyekê xwe wek sekreterê helbestên min jî nebîne, yan gerek xwedî û berpirsyarê giştî yê vê kovarê û wê kovarê xwe wek xwedî û berpirsyarê helbestên min jî nebîne.**

dixwazin ku xelk navên me jiber bikin, em dixwazin ku dezgehên çand û wêjeyê xelatan pêşkêşî me bikin. Ma gelo pisporî li ba me heye?.

Hemî helbestvan in, rexnegir in, çîroknivîs in, romannivîs û zimanzan û sazband û dengbêj û sînemazan û di eynî wextê de şanoger in; ma ev ne tiştekî seyr e? Min ji bîr kir ku ez bibêjim hemî wergêr in jî!! Baş e! Çawan yek dikare li xwe deyne û Dostoyevskî yan jî mayakovskî ji tirkî wergerîne kurdî û ew bi xwe jî dizane ku Tirkan jî ji firansî yan jî inglîzî wergerandine.. Çawan, çawan ??? Ma gelo bi vê wegerandinê wê çi ji rehmetî Dostoyevskî û Mayakovskî bimîne.. Pişt re ma tu dikarî mînaqêşeya vê tawanê bi yê wergêr re bikî! Bêguman na; de hema ji xwe re her tiştî bi vê pîvanê bipîv!

karîn û sewiyeta xwe binasin, ma gelo serokê kovareke kurdî ku rewşa çanda kurdî bi xwe ew kiriye serok, nivîskar û xwedî kovar, ma gelo rê dide rexneyên li ser nezani û ne nivîskariya wî bi xwe. Ma gelo... Ma gelo... Pirsên ji wê babetê pir in, û çîrok ne hêsan e Ehmed!

Lê bêguman; wek nimûne; wexta ku yekî wek Siyamend İbrahim helbestên min binerixîne ez dê kirasê xwe biçirînim, çinkî nivîsandina me ya bi erebî ne tenê bala Edonîs dikişand lê gelek rexnegirên Erebiyê binavûdeng li ser behemên me radiwestiyan.

Ku em vegerin û bi kurdî binivîstînin dê bibe bi paş de vegeera ji sewiyeta nivîsandina me ya ku bi erebî pêkhatiye, ji bo vê bi paş de wegerandinê gerek keysek ji me re peyda bibe; tenê keysek, da ku nivîsandina bi kurdî wek hewl-

dan ber bi pêş de bê dehdan da ku ew nivîsandin ji astenga pesindan û slogana bêreng rizgar bibe; da ku ji bilîngoya (xîtaba) siyasî ya vala rizgar bibe; da ku ji romansîzma kelê ya hemî nivîskarên Kurd rizgar bibe.

Ez bi xwe rastiye dibêjim, rastiyeke mezin û ber bi çav, renga ev rastî tal û eşdar be jî; lê realîteya me wisa ye, ma em çi bikin!? Gerek ji bo lixwemukurhatinê em hêjayî berpirsiyariyê bin. Hemî nivîskarên ku bi kurdî dinivîsinin bibêjin ku hê tu kesî ji wan li pêşiya Cegerxwîn nexistiye û naxin jî.. Di eynî wextê de ez dibînim ku Cegerxwîn bi xwe nûneriya qona-xeke pir hejar di warê siyaseta û dahênanê de, kiriye. Lê da ku bi kurdî binivîstine pir westiya, Xwedê jê razî be!

*Bêguman tu helbesta kurdî dixwînî, li gor xwendina te; em dikarin bibêjin ku bilîngoya helbestî ya kurdî berê xwe daye bi destxistina alavên dahênan û aferandina xwe, da ku xwe bigihîne deqekî nûjen?*

– Bêguman her tişt bi pêş de diçe, herwisa dahênan jî. Eger bizava nûjenkirina wêjeya kurdî îro ro hêdî hêdî bi pêş de diçe jî, lê dîsa jî em dikarin bibêjin ku ne di bareya rawestanê de ye.

Lê pirs li ser çiyetiya nûjeniyê ye, nûjenî çi ye? Çawan em dikarin bibêjin ku ev deq yan jî ew deq nûjen e?

Di baweriya min de tu carî deqekî nûjen nayê nivîsandin ku ne bi awayê têgihîştina kûrahiyên qonaxên bûrî be; angû ji bo ku em nûjen bin gerek em ji qonaxên wêjeya xwe têr bûbin. Ne ku yek hê û peyvîne belawela ji me re binivîsîne yan jî wêneyên seyrî bî karbîne wek:

Ez li bin sîka hilma reşbûna çavê te rûniştî-me...!

Ev ne nûjenî ye, ev tişteki vala û bê angû ye,

ji mîrata kurdî ya wêjeyî dîr e. Nûjeniya kurdî ji nûjeniya Tirk û Ereb û Farisan nayê. Nûjeniya kurdî gerek xwe bispêre mîrata klasîkên Kurd. Zimanê kurdî jî wek hemî zimanan e,



aliyên xurt û aliyên lawaz tê de peyda dibin, wek zimanekî xweser tu carî ji zimanekî dîtir kêmtir nabe. Zimanê tirkî wek nimûne zimanekî tevlihev e; li gel vê jî; gelek bi tirkî berhemên payedar afirandine..

Di zimanê kurdî de gelek şîyan û tenikahî jî bi nivîsandinê peyda dibin, li vir renga e ez hinekî ji mijarê derbiçim lê ezê bibêjim:Li hemberî zimanê kurdî du metirsiyê serê xwe radikin, metirsiya pêşîn ji dagirkerên Kurdistanê ye û ya diwemîn ji Kurdan bi xwe ye. Kurdên Kurdistanê Tirkîyê şerm dikin ku bi kurdî bipeyivin bi bahana ku kurdî ne zimanê siyaseta û wêje û guftûgoyan e. Ataturk wisa bi ser ket. Ne tenê wilo; berî demekê komela Komkar ya ku qaşo bi navê xizmeta ziman û çanda kurdî di-

xebite; li Swêsrayê di 2. 3. 1995-an de, ji bo Newrozê û ji bo 300 saliya Mem û Zîn, şevê çê kir. Erê, lê berpirsyarê şevê Ehmedê Xanî bi tirkî pêşkêş dikir!!

Wexta ku min nerazîbûna xwe da xuyanîkirin; yekî ji wan hewlêda ku min ji lokalê derxîne çinkî ez barûdoxên objektîv û subjektîv û çend tîrmên ji wan valatir tînahêjim..

Bêguman ez naxwazim bibêjim ku tev wisa diramin, lê tiştê ku ez dibêjim heye berdest û herbiçav e. Eger em kesayetiya zimanê kurdî venegerînin em dê negihêjin nûjeniyêke kurdî. Ev doz dozêke giyanî û madî ye jî. Zarokê Kurd yê ku bavê wî bi tirkî pê re dipeyive dê tu carî tam û çêjê ji zimanê xwe yê zikmakî nebîne, herwisa dê ne nûjenî û ne jî Kurdistan ji bo wî tiştine balkêş bin; çinkî dê hestên wî li hember zimanê wî hatibin guhertin... Miletê ku rêz û rûmeta zimanê xwe bigire dikare dest bi nûjeniyê bike.

*Nivîskarê Kurd ê ku bi erebî dinivîstne di warê bigewdekirina tirajedyaya gelê kurd de çi xebat kiriye, ma gelo rewşa gelê kurd gîhandiyê xwendevanê ereb?*

– Bi qasî ku ev pirs girîng e herwisa hestdar e jî. Piroblem ne ew e ku me trajedyaya gelê kurd gîhandiyê yan negîhandiyê xwendevanê Ereba; lê piroblema mezin ew e, ma gelo xwendevanê Ereba heye ku ji tîgîhiştina trajedyayê re amade be...? Mixabin nîn e..

Piroblema me ya bi gelên Ereba û Tirk û Farisan re jî piroblema me ya bi desthilatdarî û rejîmên wan re ne kêmtir e. Zilamê kolanê yê (Ereb, Tirk, Faris) tu amadeyî ji bo bihîztin û tîgîhiştina doza kurdî li cem wî peyde nabe, gelek caran li hemberî pirsê kurdî; ji rejîma xwe; nijadperestî û şovînitîr e. Helwestên bi vî awayî di dîroka mîletan de pir kêmtir.. Di pir-

sa bincilkirina nasnameya Kurda de giş dibin yek, çep û rast, pêşverû û paşverû. Mirov vê yekê bawer nake; herwilo jî mirov bawer nake ku Xalid Begdaş dibêje: Pirsê kurdî nîn e, pirs li welêt pirsên civakî ne, pirsên jiyana rojane ne, bêguman welatperweriya xwe bi pîvana mandelekirina mafên gelê me dipîvin.

Di warê çand û rewşenbîriyê de jî heman dîmen tîr xuyanî kirin!

Em dinivîstin... Lê wek ê ku gaberdekî (hîmekî) bi derziyê bikole... Lewra hewlêdana bi kurdî nivîsandinê dibe çêtirîn bersiv bo wan kesan.

Eger em tev bi kurdî binivîstin reng e hin ji wan guhê bidin nivîsîn me (çunkî dê bi zimanekî dîtir bin) reng e li nik pirsê kurdî rawestin. Mesele tevlihev û aloz e, pir aloz e... Ji alîkî din ve xwendevanê Ereba nema guhdide pirsgerêkên xwe îca çawan em dikarin jê bixwazin ku guhbide dozêkê ku hê pê nebihîstiyê! Û naxwaze pê bibihîze!

*Ev çend sal in tu li derveyê welêt dijî, wek serencama li paşerojê veger û bîrîkirina cî û wargehên pêşîn, tu dikarî li ser hestên nû yên ku bandora xwe li prosesa aferandinê dikin bipeyivî?*

– Ji du salan û vir de min tu tişt bi dilê xwe nenivîsandiyê. Ez di rewşek dijwar de dijîm. Pêşî ez dixwazim dorhêla xwe nas bikim, pişt re ez jî vî azadiya ku anîha tê de dijîm pir ditirsim. Ez ditirsim ku ez rojêkê ji rojan bawer bikim ku ev azadî azadiya min e yan jî min re ye û ez rabim li gor wê binivîstinim û danûstendinê bikim. Ji bo ku ez nekevim vî torê; ez hewlêdidim ku ez pir bînfîreh bim; ez hewlêdidim ku bi aramî barê vî "azadiyê" hilgirim.. Ez bi xwe jî nîzanîm ez dê çawan binivîstinim.. Di cerg û hinavên min de volkanên bêminak dilivin.. ez nîzanîm kengî dê biteqin!

*Li Kurdistanana Sûriyê bizaveke wêjeyî dest pê dike, kovar, pirtûk; gelek nav, û xirecîreke balkêş. Asoyên vê bizavê ta aniha bi awakî zelal nehatin bigewdekirin, di bawerîya te de belkoyên (ihtîmalatên) pêşerojane yên wêjeyî û zimanî yên ku reng e ji vê bareyê derbiçin, çi ne?*

– Tu bi xwe jî dibêji: "kovar, pirtûk û gelek nav.." Gelo çima li ser eniya wan hatiye nivîsandin ku pir bin? Ma ev jî ne pîrsek e?

Li Qamişloke deh kovar belav dibin. Her kovarek ji hezar hejmarî bêtir têt çapkirin. Ma tu bawer dikî ku deh hezar xwendevan peyda dibin..? Ez bi xwe bawer nakim.. Ji xwe helbestvan û nivîskarên me tu carî li xwe danayînin ku wek "xwendevan" li wan bête temaşekirin. Têra xwe xwendine û aniha ji xwe bûne nivîskar. Ez tînahîjîjim çima her sê çar kovar nabin yek û kovarek bi rûmet û bi rêzdarî nawêşînin?! Wisa dikarin bêtir nêzî hevdu bibin, dikarin bêtir bi pêşkevin, dikarin bêtir xwendevanan peyda bikin, herwisa dikarin tiştêkî berhamdar pêşkêş bikin.

Bi rastî, li gor rewşa aniha, ez tu bizaveke wêjeyî di aso de nabînim..

*Li Ewropayê, li ser wêjeyêke nûjen têt peyivîn; li ser hişyarî û geşbûneke çandeyî, ma gelo tu pîrgî pênûsekê hatiye ku bi rastî zimanekî nûjen afirandibe?*

– Eger tu tiştên ku M. Uzun û peyên wî dinivîsînin wek nûjenî û hişyarî û afirandin bi nav dikî, dêmek nûjenî heye.. eger mebesta te ne wilo be, ez dixwazim bibêjim ku çîrok ne wisa hêsan e..


Tiştê ku aniha bi kurdî têt nivîsandin Ereban bi xwe, wek wê; di wexta Impiratoriya Osmanî de dinivîsandin û navê wê dikin pîstîrîn qonaxa wêjeya erebî.

Ez nabêjim ku çend navên balkêş ên ku bi kûrbûn dinivîsînin tunene, lê ew navana di tariyê de dijîn.

Hewldana berdeewamkirina "çanda Osmanîyan" di tore û wêjeya me de planek e; pilanek veşartiyê.. Gerek em ha jê hebin da ku bihêz nebe û nebe bingeh. Da ku afirandin û dahênan rastîn nebin cihêwazî (istisna).

*Bê guman rawestana li ser ezmûneya Selîm Berekat a helbestî û pexşanî gerek e. Selîm Berekat çi daye gelê xwe?*

– Eger dîrok bêbextiyê li Selîm Berekat neke dê wî têxe rêza Homeros û Cahiz. Rastîrîn kesê ku dîroka gelê xwe bi dilsojî di berhemên xwe de bi sewiyetek bilind ji teknîk û hunera ku tu kes di sed sala bîstan de nikare pêkbîne; nivîsandiye Selîm Berekat e. Yekemîn nivîskarê ku trajedyaya gelê kurd gihandiye berzîrîn pileyên bigewdekirinê Selîm Berekat e.

Berhemên Selîm Berekat dê bibin stûnên wêjeya kurdî, yê ku wî tiştî bawer nake gerek li xwe vegere û ji nû ve hewl bide da ku xwe bigihîne tîgîhiştina berhemên Selîm Berekat. 



# Ez dîn im dîn!

"Ez dîn im dîn!"

Min kulilka te  
bi dû xwe de ji bîr kir  
Kulilka ku tu tanî bîra min...  
û birînên di teniştâ çiyân de  
tanîn bîra min...  
Hevalek ji bejna êvarê diket  
kulilk jê diherikin  
li ser berfê dibûn gol!

\*\*\*

"Ez dîn im dîn!"

Tu çî dixwazî ji toza serê min  
Cil û bergên xwe bi rûpelekê didim  
Jiyana xwe bi pênuşekê didim  
Rût û tazî ji te re dibêjim:  
Eger vê carê tu xuya nekî  
Ez dê rûnê... Wek kevirekî li bin darekê  
û herdû çavên xwe birijînim!

\*\*\*

"Ez dîn im dîn!"

Bi sirûdan haş nabim  
Ne jî bi birûskên şevê  
Axa jiyane  
çavê min têr nake!

\*\*\*

Keçê ez dîn im dîn

Lê, berfa laşê te  
di bîra min de ye  
Berfa ku tiliyên min diweşandin  
çawan ez dê ji bîr bikim  
Ma ne Şilêrên ku li pey te diman  
hişk nabin lê lê!  
Çawan tu dikarî xew bikî?  
Ma ne dema ku tu zemîneke teng î  
ez dibim lihêfa te  
Darek hezar salî me  
Min rehên xwe berdane nava te  
Xelasiya me ji hevûdû tune ye lêêêê!

\*\*\*

"Ez dîn im dîn!"

De bila hemî tiştên min bimirin  
Ku carekê tu hatî  
Li kolanê ez û dergêh  
Em dê bèn pêşwaziya te  
Pencere jî dê xwe çem ke  
himbêza te  
Helbestên bi dîwêr ve dê  
bibin ristika gerdena te  
Ji xwe, tirs, gazin, av, nan, xuya malê  
pirtûkên bêzar,  
Navên li ser dîwêr çarçewekirî ên  
Xwedê û pêximber  
Serê hişkîrî yê Xezalê  
Hemî... Hemî  
wek rêzek leşker  
Dê ji te re silavê amade bikin  
Dê li ber destên te herin û bèn lê!

\*\*\*

"Ez dîn im dîn!"

Te serê min xwarê  
Ez dê çî bikim ji gulên te  
Ma ne ew jî wekî çavên min  
diçelmisin  
Ez dê çî bikim ji gulên ter  
Ma ne her û her  
Ez zuha û hişk im lêê!

\*\*\*

Destên min ji te nabin  
ma gelo bi min re ne  
yan bi te re ne  
û çavên min  
çavê Yaqûb in  
Tu jî Yûsiv î ji bîrê dernaçî  
Lêlê  
Yaqûb im  
Yaqûbê kor û dîn im lê!

**TAHA XELÎL**

Bern 10/10/1993



## Evro, dihî, evro

Qasid hat û kaxezek îna  
 Me kaxez nexwend, qasidî got:  
     Dihî kuştin  
     Hemî kuştin  
 Piştta me çemya  
 Wek wê kaxeza me nexwendî  
     û li ser mêzê ketibû  
     û pişt lê çemyabû.

ra ra ra

Parzînek bi piştta çavên me ve  
 Pişt li çiyayan  
 sîng li hetavê.  
 Dinya pîr bû  
 çiya pîr nebûn  
 Belgêt destên me weriyan  
 Tiryê rezê van çavêt me  
 bûne mewîj  
 Destek nehata me perjan bike?  
 Ser bû şikefta  
 per û dirêşînkêt mêş û zirkêtkan  
 Berî Xwedê bibîte Xwedê  
 Heta evro tîn û diçin  
 Hindek car jî  
 di pencera çavêt me re  
 sehdkin vê dinyayê  
 Dinya di parsûyên xuşkêt me re

berê xwe didete kelehata serê  
     wendabûyî  
 ku evroke yêt bûyne DIMDIM  
 Çiya pîr bûn  
 Dimdim pîr nebû

ra ra ra

Dest sefer û  
     ser sefer û  
     pê sefer û  
     dil jî sefer.

Ziman koçer û  
     çav koçer û  
     guh koçer û  
     dîfin koçer.

Dimdim raza  
     Em ranezan  
     Her mirin û şîn bûyneve  
     her şînbûyn û zivîrneve  
     her bezin û ber bi meytê  
     xwe yê dihî zivîrneve.

Gund mezin bûn  
 bûne bajar  
 bajar mezin bûn  
 bûne tenûr  
 Tenûr pîr bûn  
 bûne kavil





kavil bûne diwanxana se û rûviyan  
Xwezî gundo  
Ne ez çi car mezin bibam  
ne tu bibaye bajarê seyan.

~\*~\*~

Parzînk li ber piyan  
Hetav li esmana  
Zirkêtk di kolanêt vî serî de  
çiyayê çoxik pîrî saçme  
Li ber sîngê min.  
Hemî şeva  
di xewnêt kevn û birêt min da  
hespek têtin  
hevsarê wî  
kezî û biskêt dayika min in  
ku hind ya çûy  
şevê daqûrtand.  
Goga gerdûn hildigrim wek hêkekê  
didanîme di nav paxla te de  
ku hêlîna destêt min bû  
û siwar dibim  
hemû dinya peya dibît  
Ez ji vî hespî peya nabim  
Xwedê pîr bû  
Ez jî pîr bûm  
Xwîn pîr nebû

~\*~\*~

Kaxezek hat qasidek îna  
Me li gel qasidî çi gotin nekirin  
di kaxezê de nivîsibû:  
Dihî kuştin  
Hemî kuştin  
Pişt li me çemya  
Wek wî qasidê me çi gotin  
digel nekirin  
û pişt lê çemya bû. **D**





## Uzunname – II

---

Berî ez li ser frazeolojî û hevoka kurdî, di romana "Tu"-yê de, rawestim, ezê we agahdar bikim, ku mebesta min ji vê yekê danasîna hevoka rast e di wêje û çanda kurdî de. Ew hevoka ku dikare kirasekî nû bi ser bejn û bala heyber de, di kultûra kurdî de, berde. Lê mixabin, ku nivîskarê romana "Tu"-yê ne desthilatê vê piştrastiyê ye. Belê, ne tenha, di warê pirkirina şaşiyana de xwe westandiyê, lê wilo jî rê ji kesekî re nehiştîye, ku nav di xwe bide, cegerê xwe xurt bike û vî barê giran bavêje ser milê xwe. Lê "barê ketî li rastê – erdê – namîne".

Min jî, ev bar bi xwe girt û di warê frazeolojiyê de, 321 hevokên ne durist, ji bedena heyberê romana "Tu"-yê derxistin. Lê min dît ku ji bo lêkolînê ew gelek in. Min, bê pîvan, yek hişt û yek avêt, mane 160 hevokên bêkêr. Lê, dîse di nerîna min de ew gelek bûn. Min werbêj kirin, mane 82. Lê dîse gelek in, we got çî? Ez tevan daxim, yan na? Eger ez li serê xwe siwar bibim û tevan daxim, xwendina romanê, ji nû ve, dimîne asanîtir. Dêmek hûnê ji daxistina wan re "na" bêjin. Ji ber sergêjayiyek, ne tenha di nivîsandina wan de, lê di xwendina wan de jî heye. Û da ez li xwe û we sivik bikim, ezê wan bikim du beş. Beşek dê sade frazeolojî be, yek jî dê tenha bi avakirina hevokan ve girêdayî be. Xwe ragirin, bavo! Ezê hineke din jî "pûç" bikim, baş e? Naxwe me li hev kir.

## 1. Beşê frazeolojiyê

Di beşê fraseolojiyê de, nivîskarê romana "Tu"-yê, dibêje:

*"Tiriyên tabnebi zû serî dan....", r. 12*

Navê "serî" yê tirî, bi kurdî, weşî (guşî) ye. Û navê dara tirî, mêw e.

Dêmek, mêw weşiyên tirî digre, û garis, sîr, pîvaz û kelem (lehane) serî didin.

*"Paşê jî we zîl, tov û sapan ji hev cihê dikirin.", r. 12*

Navê nûdera genimokan, dendikan, sîsikan û seriyên sîr û pîvazan (gava nû şîn dibin) zîl e. Tov jî, ew genimok (genim, ceh, nîsk, nok...) û dendikên ku bo çandiniyê têne hilandin e. Lê sap ew pûşê bi simbil e, ku hîna ne hatiye hûrkirin (kutan, gêrekin). Dêmek, piştî ku bender gêre dibe, tê dêran. Û genimok, di prosesa dêranê de, ji kayê têne girtin. Belê, ka û genimok ji hev têne girtin, lê kur û bav ji hev "cihê" dibin. Vêce, zîl di benderê de çî dikin!!

*"Te xwe bi şîva êvarê baş nepixandinbû.", r. 24*

Di zimanê kurdî de, navê xwarinê wextê rojê sînor dike. Belê, navê xwarina sibihê "taştê" ye, ya nivro "firavîn" e û ya êvarê "şîv" e. Pêvî van danên bingehîn li ba Kurdan sê danên alîkar, bi navên qeletûn (xurîn), taştîya palan û paşîv jî hene. Ev nav tev bi pişkê "xwarin" re têne bikaranîn, lê qeletûn (xurîn), bi pişkê "şikandin" re. De ka bêjin, "şîva êvarê" çiyel?

*"Dîya te...yepraxên birincê dagirtibûn.", r. 24*

Eprax (yeprax) têne pêçan, lê qewêrek (bacanên reş, xirtik...) têne dagirtin û rovî têne hişandin (heşandin).

*"heye ku ez xwe rakêşim tasikê."*

Xwe vekîşand = Xwe dûr kir. Xwe hilkişandin = Xwe bi ser de kişandin = Xwe dirêjî tiştêkî (kesekî) kir. Lê, xwe rakişand = Pê (bi wî, bi wê) pevçû, ango, beriztiyê. Ma nivîskarê me diberizî tasikê!?

*"Mejiyê min bûye wekî telisa gênim."*

Mêji dibe weku kundirkê (şebeşê biçûkî kal) kelandî, weku nîvişkê tavdayî, û bûye deşo (pêpelûka herî girane ji tenegehîştinê). Mêjiyê min bi xwe, bi romana "Tu"-yê re, bûye deşo...ma yê we?

*"Û ezana xwe dixwendin, ..", r. 39*

Melê bang da, azan da, lê Quran xwend.

*"Wekî dara berûyê zirav û dirêj bû.", r. 44*

Dara berûyê çiqasî zirav û dirêj be jî, di zarê kurdî de, ne bûye pîvan ji pesnê qamê re. Bejna zirav û dirêj, di kurdî de, bi dara spîndarê, şitla rîhanê û şîva xêzeranê tê bi nav kirin (pesindan).

*"Nivînên, ku di kulînê de bûn....", r. 47*

Da Kurd livînên xwe ji tozê, mişk û moran biparêzin, stêran çêdikin. Ango, livînên xwe li cihekî ji erdê bilind dideynin. Û bin wê bilindahiyê dikin malik. Navên wan malikan kulîn in. Dêmek, livîn li ser kulînan têne nijandin, ne "di kulînê de". Lê kwarên mewîj, gwîz, benî, bastîq, helîl û nokan di kulînan de dispêrin hev. Loma, di gera sersalê de, zarok dibêjin: "Kebaniyê destzêrîne, destê xwe bavêj kulînê, da tu behra qirdik jê derîne"

*"..., xwelîdankê bide ber xwe...", r. 63*

Mirov berdilkê dide ber xwe, lê xwelîdankê dideyne ber xwe. Ma xwelîdanka nivîskarê me paçikî ye!!

*"Bi simbelên...weke pûrtên jûjiyan û çavên...wekî beqan ve...", r. 78*

Bi ser ku ev hevoka pir dirêj bihnokan nasnake, dimîne em bêjin, ku "pûrt" pirçika nerm e. Û navê pora qaçilkê jûjî (jîjo) stîrî (derzî) ye. Wilo jî çav ne "wekî beqan" e, lê wekî çavên beqê ne.

*"Rûyê wî tijî, simbelên wî gir bûn.", r. 88*

Pesnê rûyê qelew (bi goşt) "dagirtî" ye. Yê laxer (bê goşt) jî "qarûçkî" ye. Lê dibe ku rû tijê zîwan, xwirî û girêk be.

*"Li ser serê wî, li dîwêr... dardekirî bû.", r. 91*

"Li ser serê filankestî" forma mildanîn, bixêr-

hatin û qebûlkirinê ye. Li vir gotina "raserî wî" şûngirtî ye. Wilo jî, morîk, benî, tizbih bi dar ve dibin. Lê, sûret têne daleqandin. Û ev rewş du formên hevokan distîne:

"Sûret li dîwêr da" û "Sûret bi dîwêr ve daleqand".

"..., were em serî bidin wan hevalan.", r. 123

Ga gurand, serî da cîranan. Lê, serek li cîranê xwe da. Dêmek, cudabûnek di navbera "serî" û "ser" de heyê.

"Serek li filankeşî da" = "çû serdana wî", lê "serîk li filankeşî da" = poçek lê da.

"Alîkî şîne, alîkî şayî ye", r. 129

Diyar e ku nivîskarê me, di warê zargotina kurdî de, xwe westandîye. Lê, ji bîr dike ku kurtebêjî û ritm rola herî giring di jiberkirin û parastina folklorê de dileyzin. Forma rast ev e: "Alîk şîn e, yek şahî ne".

"Şixul çek e

Li paşla xwe ke

Te hewce tê, derî lê veke...", r. 130

Ev zargotin jî ne li gorî zarê millet hatiye, lê li gorî zanîna nivîskarê romana "Tu" hatiye. Belê, bar li piştê dibin, lê tişt dikevin paşilê de. Forma rast, wilo ye: şuxul çek e, d' paşla xwe ke. Te hewce dî, derî veke"

"..., girtî civîyan ser sobê.", r. 132

Mirov li dora êgir dicive, ne li ser êgir. Sobe jî koziya (kûrika) êgir e. Loma, mirov li dora sobê dicive, ne li ser.

"Wî çay tiji qedehan kir.", r. 140

Avakirina vê hevokê jî ne di forma kurdî de hatiye. Formên kurdî di vî warî de ev in: "Çayê rûkir", "qedeh dagirt", "qedeh tije kir".

"- Apo zimanê te pir xweş e. Wekî şîr zelal e.", r. 153

Bi ser ku bihnok ne di şûna rast de hatiye (şûna rast, piştî "Apo" ye: (Apo, zimanê...)), lê me ne jê ye.

Di frazeolojiya kurdî de, "şîr" nîşana helaliyê

ye (weku şîrê dêya te, li te helal be), nîşana xweşiyê ye (weku şîr û şekir e), lê hîç nabe nîşana zelaliyê. Ji ber şîr bi xwe herikoxekî ne zelal e (giravî ye). Herikoxê zelal ew e, ku mirov xwe tê re bibîne. Loma Kurdan gotiye, filan tişt "weku hêsirên kewa ye" – nîşana zelalî û paqijiyê ye.

"Kalikê min giya lib bi lib nîşan min dida", r. 167

Mewj, nîsk, nok, birinc,... morîk "lib bi lib". Lê geya, "ta bi ta", "tûm bi tûm". Û "nîşandan" jî, di kurdî de, ne "nîşankirin e". Wilo jî, nivîskarê romana "Tu"-yê, bi dirêjayî, li ser navên geyayên "xwarbar" û yên "nexwarbar" diraweste. Û dibêje: "Ev hemû geyayên xwarbar in..., ev geyayê kerengê ye..., ev şîrik..., ev pûng, ev selmik...", r. 167

Kereng – navekî serbixwe ye. Lê di parçebûnê de dibe: kabîk (qûnik) a, zil (qorat, goşt) a û pel (stirî) yê kerengê. Dêmek "geyayê kerengê" bi kurdî nîne. Şîrik jî, ji malbata geyayên rotikî (darikî) ye. Ku birîn dibe herikoxekî sipî di rengê şîr de – bi navê şîrik – diberde. Ew şîrik demûştî (zeliqoyî) ye, nahêle mêş û mor, di rêya birînê re, derbasî bedena darikê bibin. Wilo jî, xwîntewrênêkê (xwerhê) çêdike. Û ji ber ku darikeke bi hest e, li ber awazên dilovan serê xwe ditewîne. Loma, jê re "darika Siyamend" tê gotin. Dibe xwarin (êm) ji pez û dewaran re, lê nayê xwarin. Erê "pûng" geyakî xwarbar e, lê bihîrîr weku desinfektor (muttehir), ji laşê şimza û zarokan re, tê bikaranîn, Ji ber şûştina laşê biçûkan, bi ava pûngê, bihna lêş xweş dike û wî paqij dihêle.

Selmik (senemek, selemek) nayê xwarin, lê ava wê (piştî kelandinê) ji bo zikcûnê tê bikaranîn. Ji geyayên nexwarbar jî "kelemper" hatiye. Lê, nivîskarê me nizane ku kelemper darika kerengê ya hişk e. Û kelemper havîn û payîzan ber bê dikeve, ne buharan. Loma, bi kurdî, di pesnê şepirzatiyê de hatiye gotin: "Filankes weku ke-

lempera ber bê ketî ye." Ango, demê ew daye ber şek û pekan.

"*Guhanên mîh û bizinan ji erdê diçûn, baş dewisibûn.*", r. 173

Dû ji erdê diçe, hilm ji erdê diçe. Lê, guhan bi erdê ve dixişigin (bi erdê ve diçin). Û ax, ka, hirî, pembo, geya têne dewisandin. Lê guhan dizirihîn, têne dagirtin.

"*Qîrîna mî, bizin...*", r. 183

Marîna mîh û bizinan, orîna çêlek û golikan, hîrîna hesp û mîhînan, mirîna hirç û şêran... Lê, "qîrîna" mirovan, bavo!

"*...cihê herî hov û bi xof.*", r. 183

Di mîtolojiya kurdî de termek bi navê "Semirhov" (tebayê bi terî û şipê) heye. Dêmek, meriv (mirov, mirhov) ew kesê (tebayê) xwedî mêjî ye. Ji ber dijraberiya "hovîtiyê" "aqilmendî" ye. Wilo, cih nabe "hov", lê cihê "bêhov", di folklorî kurdî de, ew cihê ku kes û kûs lê nebe.

"xof" jî gotineke Erebtî ye, bi wata tirsê ye.

"- *wekî dengêki ku heft qat ji binê erdê dibat* -", r. 187

Nivîskarê me çî dixwaze bêjel? Ji ber "dengê heft qat" = dengê heft bar = dengê heft car = dengê heft deng. Lê, ne ev e mebesta nivîskar jî avakirina vê hevokê. Dixwaze bêje, ku deng wilo melûl bû wekî ku ji heft qatên binê erdê derkeve.

"*Û em dizanin hûn hatine xapandinê.*", r. 208

Mirov tê dîlanê, lê tê xapandin.

"*Di nav dengên şiv, ço, şitlên hinarê...*", r. 216

Ji prosesê rakirina tûmek bacan (îsot, kelem,...) re, jî makmişarê û çandina wî di mişareke nû de, şitilbelakirin tê gotin. Eger ew tûm, piştî rakirin û çandinê ji nû ve şin hat, jê re tê gotin "şitil", ango vejîya. Û ev şitil nazik e, bi kêrî lêdanê nayê. Lê, di folklorî kurdî de "şiva ter", bo şkencê, hatiye naskirin. Û ji şivên ter, şaxê (şiva) hinarê bi nav û deng e.

"*Te kiribûn weke seradê.*", r. 218

Bi lêdanê mirov dibê "heban" (di nepixe, tê pîvdan), lê bi beran (fişekan) û şilfên kêr û xen-ceran mirov (laş) dibê "serad".

Gotina "serad" di pesnê rewşeke halo de, ji ber awayê avakirina tora wê, ketiye folklorê kurdî de. Serad hemî qul e, parçên sax di tora wê de nînin. Loma, laşê bibe "serad" dixerime (qulqulî dibê).

Li min negrin, kulê min pir in... nayên gotin. Bi ser wilo de jî ezê, di dawiya vî beşî de, bihna we bi pêkenînokekê fereh bikim, baş e? Dibêjin, yekî di civarekê de dest pê kir:

-Na, na, nebêjin...ez pênc salan li Afrîkayê mame. Li wir yan wê te bikujin, yan jî wê bi te bikin!

- Û tu... çî bi te kirin?, yekî pirsî.

-Ez, yabooooo!...Kuştim.

Di mîne ez bêjim ku girtiyên me bi xwe, di zîndanên de têne "pîvdan". Lê yên zîndanên Tirkî çawa dibîne "weke seradê", hûn bêjin?

## 2. Beşê avakirina hevokan

Piştî vê rawestanê, vê vehesandinê, çare ji ba xwedê ye, lê çara min, derbarî beşê didiwan ji vê lêkolînê, namîne. Ev beş jî bi avakirina hevokan ve girêdayî ye. Nivîskarê hevoka rind jî ew e, yê zanibe hevoka rast û durist ava bike. Hevoka çak, rind, rast û durist jî ew e, ya ku avakirina wê sivik û rewan be, ya ku bi terz û evdazên zîman, rêzîman, rêzîman û rastnivîsê ve girêdayî be, û wan pêk bîne. Dêmek, ew nivîskarê ku nav û alavan ji hev derxe, pişk û pesnan bi zanebûn di şûna wan de daxê, xal, xişk, kevan û neynûkan binase, zanibe kengî pirsnişan, seymnişan û dabiran rast û şûngirtî deyne nivîskarê hevoka rind e. Di vî war û çarçewê de ezê li ser avakirina hevokên romana "Tu"-yê rawestim. Me li hev kir? De baş e.

"*Tiştên, ku dê bikarana, kirin kêzê.*", r. 32

Di rastnivîsa hevoka ingilîzî (kill him, not let

him go) de, navê vê bihnokê bûye bihnoka mirinê. Ji ber danîna wê berî "not"-ê fermana mirinê dide, û piştî "not"-ê fermana serfiraziyê dide. Lê, bihnoka M. Uzûnî, di vê hevokê de, çi rolê dileyize? Eger nav lê bibin, mirov dikare navê "bihnoka pişpêkirinê" lê ke. Gelo, çi kirin Kêzê!?!... darek kirin Kêzê!! Na, nivîskarê me dixwaze bêje, "Tiştên ku dê bikirina kirin, Kêzê!" Ji ber bang ji Kêzê re ye, ne piş bi Kêzê dibe, weku ji danîna bihnoka tê xwiyakirin.

*"Te diwiya, tu di dawîya xwe de daxwaz..."*, r. 45

Nivîskarê me, ne "di dawîya xwe de", divabû daxwaza "komîsar" ji dêya xwe re bêje. Lê, "di dawîya xebardana (peyva) xwe de".

*"..., te dixwest tu ber bi wî dengî bizivirîni xwe."*, r. 73

Forma avakirina vê hevokê, ji çi zimanî hatibe wergerandin, ne formeke kurdî ye. Ev hevok, bi kurdî, halo ava dibe: "Te dixwest xwe, ber bi wî dengî de, bizivirîni." Dêmek, hevoka "ber bi wî dengî de" dibe hevoka navbir (alîkar) û "te dixwest xwe bizivirîni" dimîne hevoka bingehîn.

*"Te dixwest, ku tu bi kêmanî serê wî camêrî tanî ser çokên xwe, Û tu di ser wî xwar bûyî, ku binasî."*, r. 83

Hawar, ma ev hevokeke kurdî ye!! Na, na, na!! Ev hevok, di warê rastnivîs, rêziman û avakirina xwe de çewt hatiye. Eger mirov pişkên "kirin" û "anîn" bide ber hev û wan, di vê hevokê de, bi "xwestinê" re veguhêze, dibe "Te dixwest,... kir..." Lê, forma durist: "Te dixwest,... bikira..." Û tiştê nivîskar dixwaze bêje, eve: "Te dixwest, ku tu, bi kêmanî, serê wî camêrî binî ser çokên xwe." Dêmek, hevoka bingehîn ev e: "Te dixwest serê wî camêrî bînî ser çokên xwe." Dawîya hevokê jî dibe: "û bi ser wî de xwar bibî, da binasî."

*"Qisa dawîya diya te dîsan dihate bîra te..."*, r. 84

"Dawîya diya te", di vê hevokê de, aloziyeke mezin berçav dike. Û da hevok rast ava bibe, û bê alozî bê têgihîştin, gereke hevoka navbir (alîkar) tê de bê diyarkirin. Diyarkirina vê hevokê jê bi vî awayî dibe: "Qisa diya te, ya dawiyê, dîsan dihate bîra te..." Belê, hevoka bingehîn jî ev e: "Qisa diya te dîsan dihate bîra te..."

*"- Zû bike lawo zû, bilezîne."*, r. 85

Pişkê "kirinê" li vir, aloziyeke frazeolojiyê di xwe de diveşêre. Eger, em "lawo" bi "keçê" biguherin, ferman dibe: "zû bike keçê..." angò, "zû piş bi keçê bike". Û, ev avakirin ne durist e. Hevok, bê alozî, bi vî rengî ava dibe: "lawo, zû bike, zû..." Lê, bi ser vê yekê de jî, hevok dimîne hevokeke tirkî, ne kurdî. Ji ber "Oglim" ê tirkî, bi wata xwe, ne "lawo" yê kurdî ye. Û hevoka Kurdî, ya ku "lawo" bihewîne, dilovaniyekê di-de xwiyakirin, ne fermaneke leşkerî.

*"Ew fam kirin dijwar e."*, r. 96

"Fam kirin" û "famkirin" du rewşên ji hev cuda ne. Belê, nivîskarê me dixwaze bêje, ku famkirina bajarê Diyarbekrê dijwar e. Dêmek, bê serêş, "famkirina wî dijwar e."

*"Agirê sobê te germ kiribû."*, r. 116

Mirov avê germ dike, lê êgirî gur dike. Agir jî mirovî germ dike. Aloziya avakirina vê hevokê rêzimanî ye. Eger "te" bibe "tu" û "kiribû" bibe "kiribûyî", hevok bi duristî dibe: "Agirê sobê tu germ kiribûyî". Daxwaza nivîskarê me jî, avakirina vê hevoka dawî ye.

*"...û di mixekî de ku di oda xweşustîne de bû daliqand."* r.132

Hevoka "ku di oda xweşustîne de bû" hevokeke alîkar e, û hebûna wê struktura hevoka bingehîn naguhêre. Lê, bi hihnokan, ne hatiye şnorkirin. Belê, piştî "de" ya pêşî û berî "daliqand" bihnok gerekî.

*"Ew ji saet 8-an re 5 bîmîne ji derî xuta bû."*, r. 148

Avakirina vê hevokê ne durist e. Bi ser vê yekê

de ji, avakirina wê ne kurdî ye. Dem, bi kurdî forma "kêm" û "û" distîne. Nîmûne: saet 8 kêm 5, saet 8 û 5. Wîlo, hevoka M. Uzunî dibe: "ew saet 8 kêm 5 ji derî xuya". Lê, hevoka navbir (alîkar) "saet 8 kêm 5" bi bihnokan ne hatiye sînorkirin. Û ev tevlihevîkê, bi hevokê re, çêdike.

"*Û di nava xwîne de ji xwe diçûm...*", r. 176

Di "nava" hêkê de, lê di "nav" xwînê de. Wîlo jî, "ji xwe ve diçûm" ne di formeke kurdî de hatiye.

Forma rast, bi kurdî, ji vê hevokê re, ev e: "di nav xwînê de gevizim" û "ji dest xwe diçûm".

"*Piştî gereke kurt..., te anîn dereke.*", r. 182

Bê ku mirov li ser şaşiyên rêzimanî, di vê hevokê, raweste, hevok bê dawî kutayî dibe. Belê, "anîn dereke" çawa?. Dereke nerm, dereke germ, dereke terî, dereke sar, dereke bi tirs....!?

"*teng û ji dinê dûr, de diviya....*", r. 184

Dibêjin, yekî gundî xwest tinazên xwe bi meylayê gund bike. Rabû pelika şemiyê, ji roznâmê rakir, danî pêşiya pelika inê û pirsî:

– Seyda, îro çiyê?

– Îro, in e, melê lê vegerand.

– Na seyda, şemî ye, wî got.

Bi vê gotinê re melê destê xwe avête roznâmeyê û lê meyzand, dît ku rast şemî li pêşya inê ye, got: "De bi pêxembran, vaye min 50 sal emir kiriyê, heta niha ji min weye, ku in berî şemiyê tê!".

De "bi xwedê û pêxembran", ev 25 salin ku ez mijûlî kurdî dibim, hîna min bihnok di vî warî de nedîne!

"*Çima ji tirsan, hundîre te her diçû zêdetir dibû?*", r. 206

Nivîskarê me, çî dixwaze bêje! Gelo, ji tirsan, nava wî (zikê wî) diçû?! Gelo, tirsan nava wî, bi wext re, zêdetir dibû? Çilo be, hevok ne durist hatiye avakirin û bi kêsîmê xwe, ne hevokeke kurdî ye.

"*Ji dengên kursiyayî dixuya, ku li pêşiya te dere-*

*ke rûniştin*", r. 207

Ez di bextê we de me, ma ev jî hevok e! Nivîskarê me dixwaze bêje, ku "li dereke nêzik, li pêşya te, rûniştin". Yan jî, "ji dengên kursiyayî dixuya, ku nêzikê te rûniştin". Ev "dereke" ya ne di şûna xwe de hati, hevokê jî kokê dihêrivîne.

"*Weke ku dibêje ro tuneye, heyv, stêrk tune ne. Çawan gelekî dihate înkarkirin?*", r. 208

Li vir, bi ser ku hevok ne durist hatiye avakirin, rewş bi tiştên ne desthilat ve tê girêdan. Dêmek, seyrnîşan (!) di şûna pirsnîşane de gerek e.

"*Ev çawa pirs bû?*", r. 209

Nivîskarê me ne pirsê dike, lê ji pirsên bersivdarên xwe matmayî dimîne. Dêmek, şûna pirsnîşanê, seyrnîşan gerek e. Lê, dîse hevok bi kurdî saz nabe. Hevoka Kurdî, di vê rewşê de, bi vî rengî ava dibe: "Ev çî pirs bû!" Yan, "ma ev jî pirs bû!"

"*Her derên te mîna, ku tu ketibûyî nav destarê eş diêşyan.*", r. 212

Ez li beşê frazeolojiyê venagerim, û şaşiyên pêve girêdayî nema berçav dikim. Lê, di warê avakirina hevokan de, hevoka bingehîn ev e: "Her derên te diêşyan." Gotinên din tev dikevîne bejna hevoka şirovekirinê de. Wîlo, şûna rast ji danîna bihnokan re, berî "mîna" û "berî diêşyan" berçav dibe. Dêmek M. Uzun pergälên rastnivîsê jî, bi duristî, pêknayîne. D

**Uzunname bi "Romaniya romana TU"-yê  
di hejmarê bê de berdevam dibe**





## Şêxê Kesk

Şêxê Kesk li bajêr e...

Şêxê Kesk li Amûdê ye...

Ji sînorên Kurdistanê bakur dest pê dike ta tixûbên Qamişokê ta ku dawî dighêje gundê Berko; ev gundê ku bi hundir û bi heriyê nixumandiyê..

– Farûq de li tembûrê xîn!

Farûqê di çêsnê rovî de... kur amê min. Cigareyekê sor dike û dûmanê dicû... Şêş meh derbasbûne û Farûq qisekirin ji bir kiriye. Şêxê Kesk dibêje:

– Ziman xweşiya Kurdan e, yê ku jibîr kir hêwirî.

Farûq bi çavên xwe yên xemgîn; kevnar; germ, li Şêx temaşe dike, piçekî cigarekêşana xwe radiwestîne. Ji bilî bi Şêxê Kesk re bi tu kesî re napeyive, ji gund derdixin û ber bi çola bakur de dirin. Li nêzî wan; esmanê zîvîn û Şêrîna ku bi dixweşi çavdêriya wan dike:

– Zimanê Farûq geriya.

Gurzek pûng, tembûra dirêj, û zerika zêrînî ya lalo; zerika mişt ard, ardekî efsanewî bû, ji bo dengê xwe yî bi lalîtiyê rapêçyî, dixwar.

Ax.. Ax.. Ey dilê min î bi zarokan xemilandi.. Ey Helepçe..

Di wê çolistanê de, ji bilî hestên dijwar ên Farûq, tiştêk nîn e. Li serdema xwe û li serdema apê xwe temaşe dike, têlên tembûrê di nav destên wî de vedizîlin, sîber û terîşa nişankirî

ya ala Kurdistanê ji nav têlan diherikin.

Du reşik di şevê de.. di zimên de geryanê dikin, ziman dikin pûng; Şêx pûngê dicû, û Farûq jî wê li tevî ard û lalîtiya xwe dike. Ji Xecokê ta Mozan li gundan digerin, aso dikeritînin, demê jî bi leza xwe av didin, di hestên Kurdan de şîn tèn: Sazbendekî gerokî/ Şêxekî ji ne'ne'ê û ji dilovanîyê.

– Apo.. Kulîlkên hibrê careke dî geş bûn!

– Devjêberd kurê min. Ew xweşiya Kurdan e.



Çek dereng hatin. Qunsil ew xapandin. Di şûna çekên giran de, dewleta mezin, sakoyên leşkerî û nişanên serbazan û hinek barûd ji wan re hinartibû. Pir bilez nûçe ji Aşê Elawî hatin û qereqola bajêr derbaskirin û gihîştin gora Şêx Sedeqa.

Û li bakur.. bakurê herdemîn. Bakurê leşker û penaberan, nûçe ji gundekî giha gundekî din: Qazî Mihemed hat kuştin..

Siberine lawaz xwe davên ser bajêr, ewrine zîvînî di ser serê Şêx re derbas dibin, payîzê; bi ser balendeyekî zer de tîr dikin, û Farûq jî bi ser gewriyeke şikestî wek camê, tîr dikin. Bi hêminî rûniştin, bi westan rûniştin:

– Apo! Porê te sipî bûye û gavên te giran bûn e?

Giraniya xwe spart ser min, û me berê xwe da goristana bajêr, çend guleyan Şêrînê şiyar kirin:





- Tu ji bo çi hatiya vir keko?
- Da ku em kaxezan bibin.
- Kî bi te re ye?
- Apê Şêx.
- Lê mirî ye?
- Li wî alî goristanê ye.

Şêrîn û firîşteyên xwe, apê min û kesên xwe yên ku li esmanan digerin, îro yekî din li wan zêde bû, bi şarezayî ew durust kir û ber bi esmên de berda, lê pişt re ji mêvanê nûhatî westiya, çinkî birînê Qazî Mihemed ter bûn, û ew bi xwe jî bêcîr bû:

- Ma General bi ku de çû?
- Nexçeya komarê bi xwe re bir û bû pûng.

Şêxê Ne'ne'ê şêxekî bê minak e, tûcina wî, qelûnên wî, riha wî, tiliyên lertzokî, rengvedana ronahiya li ser berçavkên wî yên şevîni, gustilka wî ya reş, guncîna wî li gel Farûqî, şiyana wî ku bibe nûnerê şevpestan, kenê kesk, navê wî, û şalê ku di wexta xermîniyê de nazîkbûna xwe pê dipêçe, dudiliya wî berya ku asîtanka dergeh derbas bike, tariya destên xwe ber bi jora dergeh ve dizivîrîne, xanî bi sîberên dûr ron dibe, nediyar dilivîn; kesk in jî pûngê ne.

Gazî min dike, gazî biraziyê xwe dike... Ji min dipirse: Ma gelo min tiştek ji bîr kir?, bi mamostayeti xwe jî nav sîberan ber bi rojê de radikişîne û şahînsahiya xwe yî nûranî dadimezirînc, di navbera kêlik û kêlikê de radiweste û çavdêriya dêwarên herîni dike, kêrekê derdi-

xîne û piçekî dikole:

- Ev axa Şermola ye... Min li vir veşêrin.

Û Şêxê Ne'ne'ê hemî şekirên di çêja ne'ne'ê de ji firoşgehên bajêr kirîne, qutiya şekir di sindoqekê de veşartine, sindoqê diguhêze odeyê, li wir, di odê de çar salan û sê mehan û çar rojan dimîne, pişt re sindoqê derdixîne:

- Ev salana salên mirina Şêrînê bûn; Şêrîn pîrozmanda malê, pêximbera hêlanên esmanî.

Şêxê Kesk li hemî dergehên bajêr dide, şekirên xwe li hemî xelkên bajêr belav dike, mal bi mal, dîwar bi dîwar.... Ew bîna şekirên xwe yên ahangamêz belav dike.. û bi dengê xwe yî taybetmend helbestên Cegerxwîn distirê.

•••••


Roj bi roj wêran di giyanê Şêx de pirtir dibin, Mîrê Botan gazî wî dike, lê bê bersiv e, nivîseke nû ji hejmara nû ya kovarê re dixwaze, lê bê bersiv e, nimêjan jê dixwaze, û nimêj ji riha wî ya kesk bi dûrketine, anuha di ne'ne'ê de ye, rondika Qazî Mihemed dibarîne, ji hevrêşima bîranînan ber bi terîşên kesk ve sernişiv dibe, her roj derbasî firoşgeha Hec Qiço dibe..., firoşgeha dirêj, bejna wî ya di çêsnê berbangê de, paltoyê ji çerm, perwana ji kertone, çaroxa sor, merdiya cawbira almanî, bîna caw û neynikê.. li destê çepê westana neynikê, Şêxê Kesk gazeke ji cawekî kesk dikire, bi lez vedigere malê, caw tîş- tîş dike, terîşan û tîşan di bîrikên xwe de bi cih dike, û bi rêdikeve.. zilamek e di zîman de dûr e, dûr e û ber bi goristanan de diherike, gora Şêrînê bi terîşan dixemilîne, çend karjimêran bêdeng dimîne, pişt re, bendewariya kurtepista narîn a ku ji zemîne derdiçe, dike:

- Dengê Farûq e?

Tu yara hesin î.. Tu Şêrînê yî, tu xweşiktirîn jin î.. Di afirandina Mîdiyan de tu xweşiktirîn zîman î.. Te bi tenha û dûr hiştine... Ey Şêrîn!

Ez bendewarê kirasê te yî sipî me ku pêşinde xwe li ba bike.. ku pişt re kulîlkên zer jê bifirin; kulîlkên ku rojekê me ew ji bêzariya xwe çêkiribûn, ku ber bi dûr ve bifirin; ku di navbera pîfikirina zurvevan û rengên dengbêjê kor û amadeyiya qunsilê bêbext de bifirin.

Vedigere, wek şêxekî ji pûngê û ji çêveçîvê, vedigere neynika tenhatiya xwe, bi bêdengiyê ke giştî tê rapêçandin, Mîr dibêje:

– Farûqî Şêx xapandiye.. dengê wî jê stendiye û ardê xwe dayêyê. 

## Kovareke kurdî ya nû – DELAV –


**L**î gor ku ji nivîsa redaksiyona kovarê diyar dibê, ev kovar ji aliyê komîteyêkê ve ku xwe bi navê "Ronis" bi nav dikin, li Sûriyeyê tête weşandin. Ev kovar di ebada A4 de ye û ji 16 rûpelan pêk hatiye. Hejmara yekem a vê kovarê di tebaxa 1995-an de derketiye. Lê kovar çend rojan an mehan carekê tê weşandin ne diyar e. Her çiqas ez dibêjim kovar ji, lê li ser wê hatiye nivîsin ku ew "rojnameyêke toreyî, çandeyî û serbixwe ye."


Di vê hejmarê de li gel him nûçeyên kulturî, çirok, helbest û nivîsên li ser zimên hene. Çiroka Ebdulhelîm Yûsîfî ya bi navê "Bihna Qedex" dike ku kovar bê swendin. Nivîsa Qado Şêrin ya li ser yekbûna nivîskarên Kurd ên li Sûriyeyê ji balkêş e.

Lê li vir divê bête gotin ku ev kovara ku piştî 50-60 salan li welatê "Hawar" û "Ronahi" yê derdikeve, gihastina mustewaya wan li wir bîmîne, pirt bi şûnde ye. Bi taybetî ji di warê rastnivîsîna kurdî de ji dêlva pêşkerîne paşkerîtin heve. Delav diviyabû piştî gelek tecrûbeyên wek: Gelawêj, Sîrêr, Gulistan, Zanîn, Aso, Pîrs, Gurzek Gul, Buhar, Xumav, Roj û yd. hin bi rêkûpêk û tekûztir derkerîba.


Ji nivîsan tê fêmkirin ku ev komîte, wate Ronis, dixwaze bibe bingeha yekîtiya nivîskarên Kurd li Sûriyeyê û bi îddiyên mezin

wek: guhertina tipên (pîtên) Ç, Ş û pêkaniya zimanekî yekgirtî ji zaravayên kurdî, derdikeve meydana. Lê dema berhe-ma wan ev kovar be, bi ya min divê ev hevalana di ciyê ku bi îddiyên mezin rabûn, bila bi îddiyên piçûk dest pê bikin da ku bikaribin bîcîh bînin. Ji xwe min ji navê komîteyê, wate ji bêjeya Ronis tiştêk fêm nekîr. Min him li ferhengên Kurmanciya Jorê him ji yên Kurmanciya Jêrê nêrin, lê ez rastî bêjeyek weha nehatim. Li gor wan: "ronis bi wateya ronkayiyê hatiye, ji bo li her ci û warê tari ronîs bike..." Ya ez dizanîm warên tari ronî dibîn.




Divê bête gotin ku hevkarîya nivîskarên Kurd ên li Sûriyeyê – ne hemû bin ji –baş e û dikare xizmetekê ji kultura Kurdî re bike. Ji vî alî derxistina kovarekê bi hev re baş e. Lê divê hevalên me yê li Başûrêrojava dev ji amatori-yê berdîm. Nexasme di warê rastnivîsîna kurdî de gelek kil û kêmasiyên wan hene û divê berî her tiştî ji xwe dest pê bikin. 

**N. ELÎ**



## XALID BABAN

Di sala 1943-an de li Bexdayê ji dayikê bûye. Di sala 1971-ê de li Polonyayê ji zankoya Krakovê belge-nameya Macistêr a endazyariyê wergirtiye. Ji sala 1980-yî ve li Swêdê dijî.



all 95





## **BO XWENDEVANAN**

**D** Piştgiriya ku ji aliyê xwendevan û rewşenbîrên Kurd ve ji bo derçûna Dugir-ê ji me re hate eşkere kirin, dê bibe neynika rehdaçikandin û çespandina peyva kurdî ya resen û zikmakane. Herwiha dê ev piştgirî bibe bingeha pêşvexistin, berfirehkirin û hilibijartina berhemên hêjayî û belavkirina deqên (tekstên) xawenhuner û çêjên bi hinavên renckêşan û azarkêşana gelê kurd ve girêdayî bin, bi trajediya wî hatibin ristin û honandin.


Lewra em spasiya nameyên ku ji Emerîka, Ewropa, Îran, Sûriye û Tirkiyeyê hatine dîkin.

Herwiha em soz didin ku şaşiyên çapê yên di hejmaraya yekemîn de, dê tu carî nema dubare bibin.

**D** Em vê hejmarê jî, ji xwendevanên xwe re, wekî nîmûne dişînin. Ji hejmaraya sêhemîn û pêve, dê Dugir tenê ji bo aboneyên xwe bête hinartin.

**D** Aboneyê ku hejmaraya sêhemîn negihêje destê wî, tika ye, di cih de me agahdar bike. Ji ber ku çend kvîto, meqbuz, bê nav û navnîşan hatine razandin.

**DUGIR**



# DUGIR

Kurdisk litteratur tidskrift  
Box 3437, S-165 23 Hässelby -Sweden



Di wê rojê de, her ku  
keriyên talanbûyî di nav  
xirecira toza rêçên  
bêdawî de, dimirin, her  
ku diwarên xerîbiya  
bêbext li gerdena  
xwewnê tengtir dibûn û bi  
ser gavên te de diherifin,  
pencere û dergehên  
azadiyê di hesreta axa bê  
guneh de zûha dibûn, tu  
sazbendekî şeyda û  
bengîn bûyî...

Di wê bişirînê de, her ku  
dilê te di esmanê tarist-  
ana çiyana de dicûrisî;  
vêdiket û çavên te yên  
mişt şînî li ber pêlên  
xwînê dibûn kelekên  
derya bendemanê, tu  
qublenameya karwanê  
sergerdan û windayî,  
bûyî...

Di wê mirinê de, her ku  
destên te dibûn sipîndar  
û peyvên te dibûn  
hehecikên koçbariya  
qonaxan, tu di gorê de  
nişana mirovan bûyî...